

kovara hunerî, çandî û lêkolînî ya kurdên anatoliyê

bîrnebûn

hejmar 65 | 2016







Komcivîna KOMKURD-ANê ya giştî
Sînemaya kurdî
Sîyarê Têrika

Bi zaravayê mikaîliyên Polatliyê

<http://apecpublishing.com>



GRANIAS TĀRAR



Weşanxaneya APECê



Komcivîna KOMKURD-ANê ya giştî



Sînemaya kurdî



Hevpeyvîn:
Nedîm Dağ

Bilge bir Şexbizeynî



Sîyarê Têrika -8 Bi zaravayê mikaîliyên Polatliyê



Rojnamegeriya kurdan û kurdên Anatoliya Navîn



bîrnebûn

ISSN 1402-7488

Tidskriften utkommer 3 nummer per år.

Çar mehan carekê derdikeve.

Utges av Apec Förlag AB

hejmar 65 | 2016

Ansvarig utgivare: Ali Çiftçi

Editor: Ali Çiftçi, Seyfi Doğan, Muzaffer Özgür

Koma hevkarên vê hejmarê

Ali Çiftçi, Dr. Mikailî, Xizan Şilan, Muzaffer Özgür,
Nuh Ateş, Seyfi Doğan, Mem Xelîkan, Hesen Huseyîn
Deniz, Mûlla Evîndar, Fatih Aydın, Muhammed
Gözütok , Adem Özgür, Vahid Duran, Şükrü Yıldız,
Fatoş Koyuncuer, Memduh Selim, Xamgeli Bane,
Özgür Kara, Smayle Şêxbizeynî

Adress

Navnîşana li Swêdê
Box: 8121, SE 163 08,
Spånga/Sverige

E-post

info@apectryck.se

Internet:

www.birnebun.eu

Têkili/Îlişki

Danimarka: Irfan Baysal, 0045-27 11 58 83

Belavkirin / Dağıtım

Ewrupa:

Muzaffer Özgür

Birnebûn

Postfach 900348, 51113 Köln / Almanyaya

Tfn: 0049-172 298 24 51

Türkiye

İstanbul

Selahattin Bulut/Medya Kitapevi

İstiklal Caddesi, Elhamra Pasaj No: 130/6, Beyoğlu

Biha/Fiyatı:

Europa: 5 Euro

Türkiye: 5 TL

Abone

Swêd: 400 SEK • Almanyaya 50 Euro

Welatên din ên Ewropayê: 50 Euro

İsveç hesap numarası: (Birnebûn) bankgiro: 402-2224

Ji bo aboneyên li derveyî Swêdê / İsveç dîşındaki aboneler için

APEC, "Birnebûn" Bankgiro-Stockholm/Sweden

BIC/SWIFT: DABASESX

IBAN: SE23 1200 0000 0123 5020 6874

Çap / Baskı: Apec- Tryck AB



Logoya KOMKURD-Anê

Wêneyên bergê: Gundê Palangan 47 km li bakur-rojavayê Kamyaran li parêzgeha Kurdistanê Iranê ye. Ev gund li ser herdu aliyên ji newalekê de belav bûye. Hemû xanî ji kevira wek merdîwen li ser hev hatine çêkirin. Yanê banêya mala yekî dibê hewşeya mala yekî din. Ev gund yek ji gundên herî xweş yê parêzgehê ye. Ne tenê ji ber mimariya wê ya yekane, di heman demê de ji ber ku li xwezayîyeka bedew e. Ev li ber çemêkî ye ku diherike nav çemê Sîrwanê. Ev herêma di dema Selçûqîyan de yek ji herêmên herî girîng a Kurdistanê bû. Qela Palanganê ku li kêleka gund li ser çiyayekî ye şahidê wê ye.

(Çavkani: Komara İslamî, Wezirê İranê yê hundir).

Her nivîskar berpîrsê nivîsa xwe ye.

Ma fê redaksiyonê heye ku nivîsên ji Birnebûnê re tên, serrast û kurt bike. Ger nivîs çap nebin jî, li xwedîyan nayên vegeandin.

Waqfa Kurdên Anatoliya Navîn li Swêdê û

Komela Ziman li Almanyayê piştgirên kovarê ne.

Naverok

- Ji bîrnebûnê 6
Alî Çiftçi
- Komcivîna KOMKURD-ANê ya giştî 7
Mem Xelîkan
- Panela Bîrnebûn û Apecê 10
Adem Özgür
- Sînemeya kurdî 15
Mem Xelikan
- Kurte nêrînek li ser dîroka sînemaya kurdi 17
Muhammet Gözütok
- Hevdîtinek bi Nuh Ateş re û serdanek li
Kurdên Anatoliyayê 25
Fatih Aydın
- Vê şêxbizaynî nivir, bedu-a 28
Xamgelî Bane
- Vê şêxbizaynî nivir 30
Smaylê Şêxbizaynî
- Hunermendeki heja û zîrek;
Nedim Dag 31
Muzaffer Özgür
- Sîyarê Têrika -8 34
Dr. Mikailî
- Çend kevneşopiyên kurdên Anatoliya Navîn 44
Fatoş Koyuncuer
- Zarokên kurdan 47
Mem Xelikan
- 48 Ele Heci
Mûlla Evîndar
- 49 Westîyay me
Sükrü Yıldız
- 50 Helbest
Seyfi Doğan
- 51 Kavir
Seyfi Doğan
- 52 Zutik
Seyfi Doğan
- 54 Zû kal bûm
Xizan Şilan
- 55 Navên me -1-
Vahit Duran
- 63 Bilge bir şexbizeyni
Memduh Selim
- 66 Rojnamegeriya kurdan û kurdên
Anatoliya Navîn
Adem Özgür
- 74 Zani dalike çûn da je vîr vû û rakeje
vîr ne vû çe da vaye kirdin?
Xamgelî Bane
- 78 Demên borî
H. Hüseyin Deniz
- 87 Master Plan "Türk Kemerî" mi?
Özgür Kara

Ji bîrnebûnê

Di bin sîya kirîza koçberan ku îro li dunyayê belav bûye, kurd li başûr û rojava li hember êrîşên çeteyên "Dewleta Îslamî", DAIŞê û li bakûrê welêt jî ji bo azadîya xwe di şer de ne. Şerekî bê pêvan û dijwar!...

Li piranîya welatên Ewropa û Amerîkayê hêzên nijadperest di hilbijartinan de vê rewşa pênerên ku piranîya wan ji welatên rojhilat ber bi Ewropayê ve koçber dibin, ji bo berjewendîyên xwe bi kar tînin.

Ev kirîza koçberan bûye pirsgera yekmîn li van welatan! Ev jî bi xwe re enerjîyeka gelek negatîf peyda dike û di bin sîya vê rewşa koçberiya ber bi Ewropayê de ev dijwarî û neheqîyên ku li kurdan tên kirin, bédeng dimînin.

Li bakûrê welêt dewleta tirkan bi sîyaseteka nijadperestî, ya talan û weranker êrîşên hovane li bajarên kurdan dike. Em dibînin, ji bo kuştina kurdan hukûmet û muhalefet bûne yek li dij kurdan bi hev re biryara digrên. Dixwezî li bajarên kurdan nifusa kurdan kêmbikin, balav bikin û kurdan dîsan bi darê zorê koçber bikin. Ên ku li dijî vê politikayê derdikevin jî dikujin.

Wek qirkirina 1915 û 1938an carek din bi serê kurdan tînin. Li gor repora mafê mirova ya Tirkîyê

(TÎHV) tenê ji havîna paşîn a 2015 heta havîna pêşîn a 2016an 350 kesên sîvîl ku piranîya wan jin û zarokên ku temenê wan 10 salî biçukî in, hatine kuştin. Ev însanên sîvîl yan di hewşa mala xwe yan jî di aşxane û salona mala xwe de hatine kuştin. Ev li gor repora TÎHVê ku tenê li Cizîrê, Sura Amedê û Gevê, kirine.

Reporên otopsiya van kuştîyan nîşan didin ku însan bi zindî hatine şewitandin.

Ev komkujîyên dewleta tirk ne teseduf e ku li çiyên ku HDPê herî zêde deng stendine! Dewlet dixwaze bi vê kurdan li çar aliyê Tirkîye belav bike û dengên wan parçe bike.

Ev komkujîyên dewleta tirk ji aliyê rêxistinên mafên mirova yê wek Amnestîyê tene şopandin û arşivkirin!...

Li Iraqê hukûmeta olperest û nijadperest a ereba ev destekfîyên ku kurdan bi destxistine, nikarin tahamul bikin ku ev bajarên kurdan niha rizgar kirine, bikevin nav îdara herêma Kurdistanê.

Pêwîst e kurd li hember biryarên kuştina kurdan bi hev re tevbigerin û ev rewşa ku niha rûdaye ji bo berjewendîya serxwebûna Kurdistanê bi kar bikin.

Ali Ciftci

Komcivîna KOMKURD-ANê ya giştî

Mem Xelîkan

memxelikan@hotmail.com

Dûv hewldan û xebateke dûr dirêj û mezin ve KOMKURD-AN (Komele ya Çand Piştevanî û Piştgirîya Civakîya Kurdên Anatoliya Navîn) şeş mehan berê li Ankarayê hatibû damizrandin. Komele, li 28ê meha Gulanê, komcivîna xwe ya giştî ya yekemîn pekanî.

Ji vekîlên HDPê birêz Kadrî Yıldırım û Sırrı Süreya Önder, hevseroka DTKê birêz Leyla Güven, nivîskar birêz mamoste İsmail Beşikçi, birêz Mehmet Bayrak, bi navê PKAN-E birêz Ahmet Gezer, berpirsîyarên partî û sazîyên sîvil û gelek mêvan beşdarî komcivînê



bûn. Komcivîn bi eleqedarîyek mezin berhev bû, ji her bajarêkî dorpaş Ankarayê mêvan hebûn.

Dûv axaftina jihevkirinê û hilbijartina dîvanê ve, serokê komele birêz Levent Kanat, axaftinek kir. Levent Kanat di axaftina xwe de,



Foto: Adem Özgür

hewldan û xebata li damizirandinê, astengîyên ku biderketine û çawa hatina îro anî ziman û ji bo pêşerojê pêşniyariyên xwe kirin.

Bîrêz Kadri Yıldırım di axaftina xwe de "Bi belgeyên dest me de Kurd, ji sala 1184 vir de li Anatoliya Navîn in. Li wan salan eşîra Modan hatîye li Anatoliyê bi cî û war bûye, li Anatoliyê dema Osmanîyan, tenê girêdayîyên Ankara û bajarokên wê 102 gundên Kurd hebûn. Îro li Anatoliyê, hêjmara Kurdan 2.5 milyon in." got. Di axaftina xwe de girîngîya kurdê Balayê Haci Osman Beg, endamê Kürt Tealî Cemîyetiyê anî ziman.

Bîrêz İsmail Beşikçi di axaftina xwe de "Di dused salên dawîyê



de, di xebata azadîyê de hêjmara şehîdên ku Kurdan dayîn, ji nûfisa çend dewletên endamên Yekitiya Ewropayê zêdetir in." got.

Ji axaftvanan, bîrêz Mehmet Bayrak girîngîya komelên wisa anî



Foto: Adem Özgür



Adem Özgür, Levent Kanat, Mem Xelîkan İsmail Beşikçi, Kazım Bozdağ

Foto: Aykut Gündoğdu

ziman û behsa Kovara Bîrnebûnê kir û xebata wê ya ji bo çanda KAN anî ziman.

Bîrêza Leyla Güvenê jî di berxwedan û xebata demoqratik û netewî de li ser girîngîya yekîtîya Kurdan sekînî.

Berdevkê PKAN-E birêz Ahmet Gezer, bi damizarindina KOMKURD-ANê şanazîya xwe û li pêşerojê girîngîya çalekiyên hevpar anî ziman.

Dûw axaftinan de, hîlbijartin hate çêkirin. Levent Kanat wek serokê komelê û rêveberên nû hatin bijartin. Ji pêşniyaran şûva, komcîvîn bi dawî hat.

Endamên komîta rêvebir ên eslî

1. Levent Kanat
2. Bağdagül Avcı
3. Mehmet Özsoy
4. Rifat İlhan
5. İsmail Süslü
6. Zeynep Kalın
7. Gülhan Saraçoğlu

Çîgirên komîta rêvebir

1. Adem Özgür
2. Uğur Tozoğlu
3. Aykut Gündoğdu
4. Hacı Ömer Şahin
5. Mehmet Benli
6. Hasan Koyuncu
7. Mustafa Şahin

Endamên komîta çavdêr en eslî

1. Yusuf Çakmak
2. Hızır Akbina
3. Halis Abay

Çîgirên komîta çavdêr

1. Reşat Kangel
2. Levent Yüksek
3. Osman Ateş

Li KOMKURD-ANê li ser weşanxaneya Apecê û Bîrnebûnê panelek hat sazîkirin

Adem Özgür
ademzgr@hotmail.com

Komela kurdên Anatoliya Navîn ya çandî, piştevanî, piştgirî û civakî (KOMKURD-AN), li Enqerê, ji çend xebatan û hewldanan bi şûnda hatibû damezirandin. KOMKURD-AN, li her mehê li ser çand, huner, dîrok û zimanê kurdan û kurdên Anatoliya Navîn panelan saz dike.

Panelek ji bi ser navî "Bîrnebûn û Weşanên Apecê" hat sazîkirin û di vê panelê de xwedanê weşanxaneya Apecê nivîskar Ali Çiftçi û nivîskar Nuh Ateş mêvan bûn. Herdû jî bi

taybetî li ser girîngî û rola Bîrnebûnê sekinîn. Panel, hinek dereng dest pê kir û gelek kes beşdar bûn û di panelê de eleqeyek mezin hebû. Moderatorê vê panele hevserokê komelê parêzer Levent Kanat bû. Kanat, di axaftina vekirinê de li ser girîngîya Bîrnebûnê sekinî.

Çiftçi: 90î zêdetir tenê kitêbên zarokan hatin belawkirin.

Ali Çiftçi, destpêka axaftina xwe de balkişand weşanxaneya Apecê û got ku dema ku nû dest



Nuh Ateş, Levent Kanat, Ali Çiftçi

Foto: Adem Özgür



Foto: Aykut Gündoğdu

bi karê mamostetîyê kiribû pirs-girikên kitêbên dersê ve rû bi rû ma. Ji ber vê yekê sala 1988an de weşanxaneyê Apecê hat vekirin.

Çiftçi, beşdarên panelê li ser derbarê Apecê agahdar kir û wiha pê de çû: "Armanca me ya wê demê ew bû ku me xwest em kitêbên zarokan çap bikin. Çima kitêbên zarokan? Wê demê min mamostetî dikir. Kêmasîyeka mezin ji aliyê kîtêbên darsa kurdî û yên zaroka hebû. Swêd yek ji wan welatên ku mafê perwerdeya zimanê dê ji bo hemû xerîban daye û îmkana jî jê re peyda kiriye. Ev destkevtî bi taybetî bo kurdên me mafekî baş bû. Li wî welatî kesekî bixwaze dikare zimanê zikmakî baş hîn bibe..."

Piranîya kitêbên me yên zarokan in. Me bi her sê zaravayên kurdî; kurmançî, soranî û kirmanckî(zazakî) kitêbên zarokan weşandine. Me li rû van kitêbana kitêbên lêkolînî yên ku ji aliyê kurdan bi xwe ve hatine kirine û herwiha yên ku xelkê din ên li ser kurdan kirine jî weşandine. Salê 5-10 kitêbên zarokan derdikevin. Heta niha ji 90î zêdetir tenê kitêbên zarokan hatin belawkirin."

"Min di Bîrnebûnê de tiştên balkêş dîtin"

Ali Çiftçi, berdewamiya axaftina xwe de qala girîngiya Bîrnebûnê kir. Çiftçi, da zanîn ku ji hejmara Bîrnebûnê ya yekemîn bi şûnda ew jî tevî



Foto: Adem Özgür

kovarê bûye. Çiftçi, dengkirina xwe ya li ser kovara Bîrnebûnê weng ber-dewam kir; "Ez ji Seyfî Doğan pê hesiyam ku Kurdên Anaoliya Navîn bi navê Bîrnebûnê kovarek derxistin. Min gelek meraq kir. Wê demê ji bo tekiliyê numra telefona Dr. Mikaili hebû, min eynê rojê jê re telefon vekir û min jê kovar xwest. Deh heb kovar ji min re hatin.

Cara yekê bû ku kovarek ji aliyê kurdên Anatoliyê ve li derveyî welêt derdiket. Dema min kovar xwend gelek tiştên balkêş min tê de dîtin. Ji koçberiya kurdên Anatoliya bigrê, heta serpihatî, çîrok û helbest tê de hebûn."

"Kovar, îro bi piranî kurdî ye"

Çiftçi diyar kir ku ew, di hejmara duduyan bi şûnda beşdarê kovarê bûye û berpirsiyarîya çapkirin û weşandina kovarê girtîye ser xwe. Her wiha Ali Çiftçi, ragihand ku di hejmara duduyan û vir de kovar, li Stockholmê tê çapkirin û belavkirin. Çiftçi balkişand alikarên kovarê jî û wiha got: "Bi alikariya komelaya çand û ziman a Almaniya û Waqfa kurdên Anatoliya Navîn ya li Swêdê kovar tê belavkirin.

Di destpêkê de zimanê kovarê piranî bi tirkî bû. Sal bi sal kurdî zêdetir bû. Îro zimanê kovarê bi te-wahî nebê jî piranî bi kurdî ye."



Foto: Adem Özgür

"Divê em qîmet bidin ziman"

Ali Çiftçi, li ser zimanê kurdî jî sekinî û bala beşdarên panelê kişand ser asîmilasyonê û têkçûna zimanê kurdî di nav kurdên Anatoliyayê de.

Çiftçi, axaftina xwe wiha berdewam kir: "Niha dem hatîye guhertin. Em di demekê nû ya dijîtal de dijîn. Meseleya asimilasyonê pir bi hêz û bi lêz ketiya nav kurdan. Ez xetereyek asimilasyonê pîrr mezin di nav kurdên Anatoliyê de dibînim. Eger li hember vê asîmilasyonê tiştek neyî kirin di demekê pîrr kurt de di nav kurdên Anatoliyayê de ev zimanê kurdî wenda dibe. Ji ber neslê nû bi zimanê kurdî mezin nabe, zarokên me pîranî bi kurmancî nizanin. Bi

zimanê tirkî tên perwerde kirin û mezin dibînin. Dema zimanê xwe nizanibin xwe di nav ciwata kurdan de xerib dibînin.

Dê û bav li hember zarokên xwe mesul in ku nasnameya zarokên xwe ya rast fêrî wan bikin. Bo vê jî divê em bi zarokên xwe re bi zimanê xwe yanê bi kurdî deng bikin."

Ateş: Nasname têgeheke pîrr alî û pirrengî ye

Nivîskar Nuh Ateş jî qala ziman, nasname û girîngiya Bîrnebûnê kir û ji alî xebatên kovarê de beşdarên panelê agahdar kir.

Nuh Ateş balkişand nasnameya kurd û axaftina xwe bi gotinên: "Ferd, komên etnîyî û millet bi

nasnameyê tên nas-
kirin û ji hev tên
derxistin. Nasna-
me têgeheke pir alî
û pirrengî ye. Zî-
man, ciwar/welat
û tarîx, sê sitûnên
vê yên bingehî nin.
Meriv bê nasname
nabe û nexwaze ku



nasnameya wî piçûk bê dîtî û bê
bendkirin. Kurd sedsalî zêdetir e ku
li nasnameya xwe digere, hewl di-
de ku nasnameya wî ya netewî bê
qebûlîkirin.

Rewşenbîrên kurd, nimûne Ce-
ladet Elî Bedirxan û Cigerxwîn di
berhemên xwe da bal kişandina ser
mijarên bingehîn yên nasnameyê,
bi taybetî ser ziman, tarîx û welêt.”

”Navê Bîrnebûnê bûye merqe û nişana şabûn û serbilindîyê ye”

Ateş, ji bo Bîrnebûnê jî çend minak
dan û axaftina xwe wiha berdewam
kir: ”Meriv dikare kovara Bîrne-
bûnê mîna nişan û encama lêgerîna
kurdên Anatoliyê ya li nasnameya
xwe ya milî û ciwarî bihesibîne.

Wekî li ser rûpelê pêşî hatî nivîsîn,
Bîrnebûn kovareke hunerî, çandî û
lêkolînî ye. Bîrnebûnê rolekî girîng
ji hêla berhevkirin û arşîvîkirina çand

û folklorê kurdên Anatoliyê de, ji bo
teşwikkirina xwandin û nivîsandina
zimanê kurdî de lîst û dilîze. Her wi-
ha ji bo nasandina kurdên Anatoliyê
bi giştî kêrhatî ye. Navê Bîrnebûnê
bûye merqe û nişana şabûn û ser-
bilindîyê ye.”

”Gava KOMKURD-ANê pîrr bi cih e”

Nuh Ateş, di axaftina xwe de qala
redaksiyonê û aboriya Bîrnebûnê jî
kir û ji bo xebatên KOMKURD-
ANê hin tişt gotin: ”Kar û xebata
Bîrnebûnê li ser xeta xwe berde-
wam dike. Kurdên Anatoliyê hew-
cedariya kovar, komel, sazî û dez-
gehên çandî û civakî ne. Lewma
KOMKURD-AN geveke di cih da
ye. Cardin gihanê komeleyê pîroz
dikim û bixêr û ber be.” Panel, ji
pîrs û bersivan bi şûnda tewa bû.

SÎNEMEYA KURDÎ

Mem Xelikan



Fatin Kanat, Adem Özgür, Esin Akgül Güneş, Muhammed Gözütok

Foto: Aykut Gündoğdu

Li Ankarayê, 2 avrel 2016an kurdan, bi navê "*Sîneme û Belge Filma Kurd*" panêlek amadekir. Di panelê de moderator ji Bas Nûçeyê Adem Özgür, Axaftvan: Fatin Kanat, Muhammed Gözütok

û Esin Akgül Güneş wûn. Her sê axaftvan jî, ji Kurdên Anatolîya Navîn wûn. Ew bi sînemeya re eleqedar in û her yekî ji wan çend kurte film çêkirine. Di panelê de ji bo sîneme û belge filmên Kurdan, fikir û ramanên xwe anîn ziman.



Gelek meriv, beşdarî panelê bûn. Pirranîyên wan, endamên komelê wûn.

Despêkê de birêz Fatin Kanat axifî. Fikir û dîtinin xwe yên ser sinemeya Kurdan dîyarî beşdaran kir, behsa berhemên xwe yên ji bo vî karî kir. Û bi kurtî weng got; "Kurdistan welatekî hatiye perçe kirin. Hunermend û sinemegerên têkiliyên wana bi sinemeyê re heyî, hinekan bi Tirkîye, hinekan bi Sûrîyê, îranê, Irakê û Rojavayê re bi şiklekê têkildar bûne. Di nav sinemegerên Îran û Tirkîye de, sînemegerên Kurd ê navdar hene. Wek Yılmaz Güney. Ne sineme ya Kurd, Sineme ya Kurdistanê hê rast e. Ji bo ku, sinemegerin ne Kurd jî di navda ne. Kurdistan, huro di bin zor û zordestîyeke giran de ye û şerekî giran tê dayîn. Li Sûrê, Cizîrê, Ferqîn û Gewerê halê giranî em dijîn, dixwaze wek dokumenter were qeyît kirin. Ew, pirr girîng e. Hevalên ew kara dayîn ber çavên xwe û hewldidin wê rewzê qeyitkin û bikin dokumenter hene. Niha, tu mecrayên ew belgenan werin nîmandin tunen."

Dûv ve birêz Esin Akgül Güneşê, fikir û dîtinên xwe dîyarî beşdaran kirin û bîranîneke xwe

ya dema kişandina "MÎN KÎ-YÎM" anî ziman. Û got: "Dema ku min, dest bi xebatên sînemayê kir, derdor û malbatê, xebatên min bê watê didîtin. Dema ku min Dokumentera ‚MÎN KÎYÎM‘ dikişand diya min ji min re digot; ‚Bi xwedêkê, ew film wê çi bide te? Çima cîzê xwe çênakî? Tu hesaba ji xwe re nakî“ Piştî ku min film xelas kir, bi pişgiriya Kurdî-Derê galaya wê me li Enqerê kir. Min, dê û bavê xwe jî dawet kirin. Ne gotin sar û serma ye, di rojeke bi berf de hatin wê rojê (19ê sibatê) pirr berf barî bû. Piştê ku film xelas bû, dîya min nêzikî min bû û got ‚ Te çi tiştêkî xweş çêkiriye, vana tim çêke!“ Min jî wê re got; ka te wiha nedigot. Ji min re got; "Min çi zanîbû, tu tiştên wisa xweş çêdiki" Beşdar bi wê bîranîne gelek kêfxwaş bûn û kenîyan.

Birêz Muhammet Gözütok, di axaftina xwe de fikir û ramanên xwe dîyarkirin şûva ji dîroka sinemeya Kurdan û KANê de behs kir. Axaftina wî ya li ser dîroka sinemeya Kurdan ku bi kedeke mezin amade kirî, ji bo dîroka sinemeya Kurdan lêgerineke girîng û balkêş e. Min ji bo we, ew lêgerîna bîdêrxiste jêr.

Kurte nêrînerk li dîroka sînemaya kurdî

Muhammet Gözütok

Filmên pêşîn ên ku mijara wan kurd in

Ji bo ku em bikarin destpêka sînemaya kurdî baş fahm bikin, divê em bala xwe bidin filmên pêşîn ên li ser kurdan. Mirov dikare bêje ku yekemîn filma ku li ser kurdan e filma Gras: *A Nations's Battle for Live* (Mêrg: Têkoşîna Man û Nemanê ya Neteweyekê) ye ku di sala 1925an de ji hêla Marian C. Cooperê ku derhênerê filma navdar *King Kong* e, hatiye kirin. Filma ku 71 deqîqe ye li ser jiyana eşîra Bextiyarî ya Kurdistanana rojhilat e.

Filma Zarê ku di sala 1926an de li Erîwanê hatiye kişandin li ser jiyana jineke kurd e. Her wisa di sala 1933an de li Erîwanê bi navê *Kurdên Êzîdî* filmeke din hatiye kişandin. Ev film jî li ser mamosteyeke kurd e ku navê wê Zîn e. Di sala 1948an de bi navê *Kurdên Ermenîstana Sovyetê* û di sala 1959an de jî bi navê *Kurdên Ermenîstanê* du belgefilm hatine çêkirin.

Filma derhênerê Îtalyanî Guido Brigno ya bi navê *Kurê Şeytanê Spî*



Îvan ku di sala 1953an de hatiye çêkirin, kurdên ku di sedsala 19an de li Erziromê êrişî ermenan dikin, nîşan dide. Di sala 1967an de derhênerê alman Franz Josef Gottlieb kitêba gerokê navdar ê alman Karl May a bi navê *Rêwîtî ber bi Kurdistanana Hov* wekî du filmên bi navê *Kurdistanana Hov û Êrişa Kurdan* çêkirin.

Sînemaya Yılmaz Güney

Di salên 1960 û 1970an de li Tirkiyê derhênerê navdar ê Kurd Yılmaz Güney filmên serkeftî yên li ser Kurdan çêkirin. Filmên wî *Seyîthan* (1968), *Endîşe, Hêvî, Kerî* (1978) û *Rê* (1982) li ser eş û pirs-

girêkên kurdan in. Yilmaz Guney di van filmên xwe de trajedîya kurdan nîşan da û festîvala Cannesê de xelat girt û ji bo derhênerên nû yên kurdan bû mînak.

Bêguman di sînemaya tirkan de jî filmên ku li ser kurdan in, hatin çêkirin. Lê di wan filman de kurd wisa hatin nîşandan ku bi tirkîyê ke xirab an jî bi "lehçeya rojhilatî" dipeyivin. An jî di hin filman de jî kurd wekî ku tirk bin û tu cihêtiya wan ji tirkan tune be hatin nîşandan. Ango sînemaya tirkan jî wekî hemû saziyên dewletê hebûna kurdan qebûl nedikir û ew wekî tirk nîşan dan. Bi qasî ku em dizanin, li Tirkîyê yekemîn filma ku cih daye axaftin û muzîka kurdî, filma Yilmaz Guney a *Rê* ye.

Fîlmên pêşîn ên kurdî

Di destpêka salên 1990î de êdî em filmên pêşîn ên kurdî dibînin, filma *Mem û Zînê* ya Ümit Elçi ya sala 1991an û filma *Siyabend û Xecê* ya Şahin Gök a sala 1993an du film in ku li Tirkîyê bi kurdî hatine çêkirin. Herdu film bi lîstikvanên tirkan hatine kişandin û paşê bi dublaj hatiye Kurdîkirin.

Di heman demê de di dîasporaya kurdan de jî em dibînin ku hin kes

hewl didin ku filmên kurdî çêbikin. Yek ji wan kesan muzîsyenê navdar ê kurd Nîzametîn Arîç e. Nîzametîn Arîç di sala 1993an de filma *Kilamek Ji Bo Beko* çêkir. Arîç di filma xwe de ku wî bi xwe aktorê sereke bû, behsa kurdan a piştî karesata Halebceyê kiribû. Ev film li Ermenîstanê hatibû kişandin. Îbrahîm Salman ku li Holandayê dijîya di sala 1994an de filma bi navê *Rêwîtiya Bêdeng* çêkir. Di vê filmê de kirinên rejîma dîktator a BAASê di çavê şivanekî de hatibûn nîşandan. Film li Yunanistanê hatibû çêkirin û lîstikvanên filmê kurdên penaber bûn ku li Ewropayê dijîyan. Di sala 1997an de Huner Selîm li Fransayê filmeke komediyê ya bi navê *Her Bijê Zewac... Azadiya Kurdistanê* çêkir. Di salên 1990î de Mehdî Omer bi navê *Tunelê û Mano Xelîl* ku derhênerê jî rojavayê Kurdistanê ye bi navê *Cihê ku Xwedê Radizê* berhemên sînemayê çê kirin. Ev herdu derhêner jî li welatên sosyalîst perwerde bûbûn.

Fîlmên Behmen Qubadî

Di sala 2001an de derhênerê rojhilatê Kurdistanê Behmen Qubadî filma xwe ya navdar *Dema Hespên Serxweş* ku di festîvala Cannesê de



Foto: Aykut Gündoğdu

xelat girt, çê kir. Behmen Qubadî saleke şûnde *Stranên Welatê* min çêkir. Vê filmê jî di Cannesê xelat girt. Qubadî 2004an de *Kuşî jî Dikarin Bifrin* çêkir. Vê filmê di festîvala San Sebastîanê de xelata yekemîn girt. Heman derhênerî di sala 2006an de *Nîvheyv* çêkir. Behmen Qubadî li Kurdistanê, bi prodûktorên kurd û listikvanên kurd ev filmên xwe çêkiribûn. Ji ber vê jî mirov dikare bêje pêşî wî bi hemû normên sînemaya kurdî film çêkirin. Her wisa mirov divê bêje ku bi van filmên Qubadî kurd û sînemaya kurdî di rojeva sînemaya cîhanê de cih girt û di nav gelek

entelektuel û ciwanên kurd de li ser sînemaya kurdî baldariyek pêk hat.

Derhênerên Kurd ên li Welatên Rojavayê li Başûrê Kurdistanê...

Di van salan de hin derhênerên kurd ên ku li Ewropa û Amerîkayê dijîyan hatin başûrê Kurdistanê û bi alîkariya Hikumeta Herêma Kurdistanê film çêkirin. Derhênerê Kurd Cano Rojbeyanî ku li Amerîkayê derhêneriyê dikir di sala 2002an de li başûrê Kurdistanê bi navê *Fîyan* filmek çêkir. Cano Rojbeyanî paşê bi navê *Yek Mû-*

mik Du Mûmik û Chaplin of Mountains çêkirin. Chaplin of Mountains li Amerîkayê pêrar deng veda. Celal Zengene ku li Brîtanyayê dijiya li başûrê Kurdistanê di sala 2003an de bi navê *Mame Rîşa* filmek çêkir. Mehdi Umêd ku li Swêdê dijiya vejeriya Hewlêrê û di sala 2003an de bi navê *Rawe Finoke* filmek çêkir.

Sînema Kurdî li Rojhilatê Kurdistanê

Piştî Behmen Qubadî gelek derhênerên din ên ji rojhilatê Kurdistanê filmên kurdî çêkirin. Piraniya wan yekemîn filmên xwe bi kurdî çêkirin. Şîrîn Cihanî, Îbrahîm Seîdî, Cemîl Rustemî, Ferîboz Kamkarî, Rehîm Zebîhî, Taha Kerîmî, Şahram Elîdî, Betîn Qubadî, Babek Emînî ji wan derhênera ne. Piraniya wan derhêneran bi alîkariya Hikumeta Herêma Kurdistanê, li başûrê Kurdistanê filmên xwe çêkirin. Cemîl Rustemî romana Îbrahîm Ehmed ya bi navê *Janî Gel* wekî film çêkir. Her wisa filma Şahram Elîdî ya bi navê *Sirte Legel Ba* di sala 2009an de di festîvala Cannesê de xelat girt. Hejayî gotinê ye ku Şahram Elîdî par li Mêrdînê *Biranîna Hespa Reş*

kişand û îsal ev film beşdarî festîvalan dibe.

Di nav van derhêneran de mirov divê behsa Teha Kerîmî jî bike. Ev derhênerê ciwan ê ji rojhilatê Kurdistanê çî mixabin sala 2013an li Silêmaniyê di qezayeke trafikê de koça xwe ya dawî kir. Tehay Kerîmî piştî çend kurtefilm û belgefilman di sala 2010an de filma bi navê *Kwêstanî Qendil* û di sala 2013an de jî belgefilma bi navê *Hezar û Yek Sêw* çêkir.

Li Başûrê Kurdistanê Sînema Kurdî

Li başûrê Kurdistanê jî di salên 2000î de filmên kurdî hatin çêkirin. Şewket Emîn Korkî sala 2003an *Peranewe le Naw Qubar* çêkir. Hêjayî gotinê ye Şewket Emîn Korkî du filmên filmên din ên metrajdirêj çêkirin û filma wî ya dawîn *Biranînên li Ser Qevir* di gelek festîvalan de xelat girt. Dîsa di van salan de li başûrê Kurdistanê Mesud Arif û Hesen Hisên bi navê Nergîs Dibişkivin filmek çêkir. Ji van salan heta niha bi piştgiriya Rêveberiya Giştî ya Sînemayê ya başûrê Kurdistanê dehan kurtefilm, belgefilm û dirêjefilm hatin çêkirin. Kameran Bêtasî, Hawrêy



Foto: Aykut Gündoğdu

Mistefe, Serdar Hemereş, Xelîl Loqa, Bedirxan Mihemed, Fîkrî Berojî, Zerdeşt Ehmed, Dilşad Mistefe hin ji van derhêneran in.

Li Bakurê Kurdistanê Sînema

Bêguman li bakurê Kurdistanê jî di heman serdemê de berhemên sîne-

maya kurdî derketin pêş. Kazim Öz ku di Beşa Şano û Sînemayê ya NÇMyê de perwerde bûbû yekemîn kurtefilma xwe *Ax* di sala 1999an de çê kir. Öz piştî vê jî di sala 2002an de filma metrajdirêj *Fotograf* û di sala 2006an de jî belgefilma *Dûr* çêkir. Kazim Öz di sa-

la 2008an de jî dirêjefilmeke bi navê *Bahoz* çêkir. Piştî Kazim Öz li bakurê Kurdistanê û Tirkîyê gelek derhênerên kurd kurtefilm û belgefilm çêkirin. Di sala 2009an de Miraz Bêzar ku li Almanyayê perwerdeya xwe ya sînemayê dîtî li Amedê filma *Min dît* çêkir. Miraz Bêzar beriya vê filma xwe, li Almanyayê çend kurtefilm çêkiribûn. Di salên 2010î de jî hin derhênerên din dest bi dirêjefilman kir. Di sala 2012an de Orhan Eskikoy û Zeynel Doğan dirêjefilma bi navê *Dengê bavê min* çê kirin. Van herdu derhêneran di sala 2008an de jî filmeke bi navê *"İki Dil Bir Bavul"* a kurdî û tirkî çê kiribûn. Di sala 2014an de Ferît Karahan dirêjefilmeke bi navê *Derbûn ji bibuştê* çêkir. Vê filmê gelek xelat girtin. Ferît Karahan beriya vê berhema xwe bi navê *Beriya Tofanê* û *Xewna Yûsif* du kurtefilm çêkiribûn. Dîsa di sala 2014an de Erol Mîntaş yekemîn dirêje filma xwe ya bi navê *Kılama dayika min* çê kir. Erol Mîntaş berê derhêneriya kurtefilmên wekî *Butîmar* (2008) û *Berf* (2010) kiribû. Niha dehan derhênerên kurd li bakurê Kurdistanê û Tirkîyê berhemên sînemayê çê dikin. Özkan Küçük, Aziz Çapkurt, Mustafa Yeşil, Ali Kemal Çınar,

Yakup Tekintangaç, Mizgin Müjde Arslan, Fırat Yavuz, Gülistan Acet, Orhan İnce hin ji van derhêneran in.

Di salên 2000î de li çiyê ji hêla gerîlayên kurd ve jî hin berhemên sînemayî hatin afirandin. Helil Uysal ku mirov dikare bêje serkêşî sînemayê çiyê ye bi navê *Beritan, Tîrej, Eyna Bejnê, Dema jin hez bike* çend dirêjefilm çêkirin.

Rojavaya Kurdistanê

Li rojavaya Kurdistanê herçiqas filmên kurdî nehatibin çêkirin jî derhênerên rojavayî li Ewropayê û başûrê Kurdistanê berhemên sînemayê diafirînin. Mano Xelîl ku ji Qamişloyê ye û li Çekoslavakyayê li ser sînemayê perwerde bûye, ji dawiya salên 1980î vir ve belgefilman çêdike. *Devîdê Tolhildan, El-Enfal, Meşvan* belgefilmên wî yên girîng in. Hejayê gotinê ye ku Mano Xelîl îsal yekemîn dirêjefilma xwe ya bi navê *Hecîreşk* çêkir. Her wisa Ekrem Heydo ku ji rojavayê Kurdistanê ye destpêka salên 2010î belgefilma bi navê *Helebce, Zarokê wenda* çêkir.

Li Dîasporayê

Çawa ku hin berhemên pêşîn ên sînemaya kurdî li Ewropayê hatin çêkirin, hîn jî derhênerên dîaspo-

rayê berhemên sînemayê diafirînin. Ji destpêka salên 2000î ve Yüksel Yavuz berhemên sînemayî diafirîne û di berhemên xwe de behsa kurdan dike. Derhêner Kudret Güneş ku ji kurdên Balayê ye û li Fransayê dijî derheqê kurdan de hin belgefilm û kurtefilm çêkirin. Binevşa Berîvan ku bi eslê xwe ji bakurê Kurdistanê ye li Belçîkayê ji sala 2013an vir ve berhemên sînemayê pêk tîne. Belgefilma wê *Êzîdî*, kurtefilmên wê *Phone Story* û *Peyarê* berhemên wê yên girîng in. Hîşam Zaman ku bi eslê xwe başûrê Kurdistanê ye ji destpêka salên 2000î ve li Norvecê berhemên sînemayê diafirîne. Kurtefilma wê *Bawkê* (2005) gelek deng veda. Dirêjefilmên wî *Winterland*, *Beriya Barîna Berfê* û *Name ji qrele* gelek xelat girtin. Her wisa derhênerê ji başûrê Kurdistanê Sehîm Omer Xelîfe ku li Belçîkayê dijî ji dawiya salên 2000î vir ve berhemên sînemayê diafirîne bi kurtefilmên xwe yên bi navê *Xakî Palewanan*, *Bexdad Mesî* û *Nêçîrvanê Xirap* gelek xelat wergirtin.

Di nav kurdên Anatolyayê de Sînema

Herçiqas berhemên kurdî yên sînemagerên kurdên Anatolyayê di van

çend salên dawîn de dest pê kiribe jî derhênerên kurdên Anatolyayê ji salên 1990î vir ve berhemên bi zîmanên din afirandin.

Derhêner **Kudret Güneş** kurdeke Balayê ye di salên 1970yî de li Enqerê sînema xwendiyê û di destpêka salên 1980î de li Fransayê perwerdehiya sînemayê domandiyê. Kudret Güneş di sala 1999an de bi navê *Koçber* li ser jiyana sê jinên kurd ên ku li Fransayê bi cih bûne, belgefilmek çêkiriye. Ji wê demê heta niha wê gelek kurtefilm û belgefilm çêkirin. Belgefilmên wê yên bi navê *Leyla Zana* (2002), *Mehdî Zana* (2003), *Eşîra Berîtan* (2005), *Jinên ku Hatine Rencîdekirin* (2009), *di Şopa Bedîayê de* (2011), kurtefilmên wê yên bi navê *Çerşefa Sor* (2011), *Jînekolaj û wergêra wî* (2012) hene.

Yusuf Yeşilöz ku ji gundê Xelikanê Cihanbeyliyê ye ji destpêka salên 2000î vir ve sê belgefilmên bi zîmanê kurdî, tirkî û almanî çêkirine. Belgefilma wî ya bi navê *Birçîbûn li hember dîwaran* di sala 2003an de hatiye çêkirin. Ev belgefilm li ser girtiyekî kurdê bi navê Cemal Mîran e ku li girtîgeha Amedê ketiye rojiya mirinê. Belgefilma wî ya bi navê

di nav dinyayan de (2006) li ser jiyana jineke kurd e. Belgefîlma wî *Evîna muzîkê* jî di sala 2008an de hatiye çêkirin. Hejayî gotinê ye ku Yusuf Yeşilöz çend berhemên wêjeyî bi zimanê tirkî û almanî jî nivîsandine.

Fatin Kanat ku di zanîngeha Enqereyê de di beşa sînemayê de lîsansa bilind kiriye û niha jî doktora dike. Li ser sînemaya Îranê xebitiye û ev xebata xwe kiriye kitêb. Di sala 2011an de tevî Necmettin Salaz bi navê *Helebce: Hêvîya nemir* belgefilmek çêkir. Ev film bi kurdî (sorani) û tirkî ye. Bi navê *Zarok Nazik in, Yol Açan, Tek-Der, Son Bakış* çar belgefilmên din jî çêkirin. Kanat niha li Enqereyê di kolektîfa Sînetopyayê de karên sînemageriyê dike.

Mehmet Ali Baran ku ji Kuluyê ye û di zanîngeha Selçukê de di beşa radyo, televîzyon û sînemayê de xwendiyê di sala 2009an de li ser gola Dudengolê belgefilmek bi navê *Pişko dikeve* (Cemre Düşerken) çêkiriye. Ev belgefilm bê diyalog e. Baran di sala 2014an de bi navê *Kar Taneleri* kurtefilmek

bi zimanê tirkî çêkir. Kurtefilm li ser vegera gerîlayekî kurdên Anatoliyayê ya li gundê xwe ye.

Esin Akgül ku ji Kuluyê ye û karên televîzyonî kiriye di sala 2012an de bi navê *Min ki jîm* belgefilmek çêkir. Ev belgefilm li ser koka eşîra Şêxbizîni ye ku niha piraniya wan li derdora Haymanayê dijîn. Ji ber ku ev film him li ser kurdên Anatoliyayê ye, him jî bi kurdî ye, girîng e.

Muhammet Gözütok ku ji kurdên Polatliyê ye di beşa radyo, televîzyon û sînemayê ya zanîngeha Enqereyê xwendiyê di sala 2012an de bi navê *Masîvanên bêjiyê* belgefilmek bi kurdî çêkiriye. Ev film li ser wan kurdan e ku di salên 1990î de ji gundên xwe hatine derxistin û li Stenbolê bi cih bûne û masîvantiyê dikin. Gözütok di sala 2015an de bi navê *Xalxalok* kurtefilmek çêkir.

Mustafa Başaran jî di sala 2014an de li Haymanayê dirêjefilmek bi navê *Bablîsok* çêkir. Ev film jî li ser kurdên Şêxbizîni ye.

Hevdîtinek bi Nuh Ateş re û serdanek li Kurdên Anatoliyayê

Fatih Aydin

Di dema ku eleqeya min bi xwendin û nivîsandina bi kurdî re çêbûye vir ve, ez peyv û biwêjên ku li mezinan dibihîzim û bala min dikşînin, li xweşiya min diherin li ser înternetê digerrim. Gava ez li wan peyv û biwêjan digerrim jî, pîrr caran an li kovara Bîrnebûnê û malperên Kurdên Anatoliya Navîn, yan jî li ser malpera Zinarê Xamostat li wan peyvyan tîm. Aha bi vî hawî kovara Bîrnebûnê bala min kişand û ji hejmarên wê yên kevin de, min yek bi yek dest bi xwendina hejmarên wê kir. Cenabê Nuh Ateş jî min bi van xwendinan re, li Bîrnebûnê nas kir. Çîrok û serhatinên ku wî bi zimanekî hêsan qal dikirin, bi min mîna ku bi xwe hatibin serê min dihatin û min têde

gelek biwêj û peyvên ku di bîra min de ber bi wendabûnê ve diherin ji nû ve bi bîr dianîn û di ber re jî li wîkîferhengê zêde dikirin. Paşê min hersê kîtabên wî (*Nivîsên Per, Tayek Porr û Ehmedê Elê*) jî bi dest xistin [Mixabin, kêmasiyeka weşanxaneyê Apecê ya ji hêla belavkirina kîtaban ve heye] û xwendin. Dîsa ez bi wan pîrr kêfxweş bûm û çîrok û hikayeyên ku qal dikirin mîna ku hatibin serê min, mîna ku li derdora min derbas bûbin dihatin. Di ber re, danûstandina me bi rêya e-nameyan dewam kir û pê re min hu kir ku wî, bêyî ku hay jê hebe di 2010'an de bi wergerrandina min ji Weşanên Lîsê derketiye, li ser Bîrnebûnê dest bi wergerrandina Veguherîn a Franz Kafka



kiriye. Jixwe wergerr tiştêkî ku qet tucaran netemam e û zêdebûna wergerran, ya eynî pirtûkê be jî, ne kêmasî, bêguman, zêdebûneke. Paşê, me bi hev re birrî ku gava ew hat em hevdu bibîn.

Kekê Nuh, di serê mehê gulanê (ya 2015'a) de hate gundê xwe û xeber da min ku ew hatiye. Min jî, bi Xanima xwe û lawê xwe ve, tidareka xwe kir û berê xwe da Anatoliya Navîn, a ku berê min di derbarê de pîrr xwendibû, lê hîn bi çavên serê xwe nedîtibû. Di ber Gola Xwê re, me xwe gihande Qulekê (Tr. Kulu), navçeya Qonyeyê. Li wir, me bi Cenabê Nuh Ateş, re li mala xweyînga wî, bi mêvandariya dilgerm a xwîşka hêja Xecê, hevdu dît. Sohbeta me li derdora edebiyata Kurdî, Bîrnebûnê, Kurdên Anatoliya Navîn gerriya. Em bi êvarî çûne gundê Xelîka (Karacadağ), mala birayê Kekê Nuh, Kekê Hus û li wir jî em mêvandariyeka pîrr dilgerm hatin qebûl kirin. Me şorrîr kir, em ji sohbeta wî ya şîrîn têr nebûn, lê, di ber re şev jî tîr û şev dereng bû, me xatir xwest û em dîsa vejeriyana mala xweyînga Kekê Nuh, mala xwîşka Xec.

Sibê ya din ji dû taştê re me dîsa berê xwe da Xelîka, dîtina wir a bi

ro hîn xweştir bû. Me derûdora gund dît, dîsa li mala Kekê Hus û jina wî Zexê, sohbetek xweş borand, lawê min Ûsiw bi dîk û mîrîşkan kêfxweş bû û paşê me xatir ji hev xwest. Em vejerriyana Qulekê, me li wir ji Kekê Nuh û xwîşka Xec jî xatir xwest.

Ji ber ku, li Semsûrê, li gundê kêleka me jî Terzî hebûn û wan digot em ji Qirşehîrê hatine, berê jî çûnûhatin di navbera Terziyê li cem me û yê Qirşehîrê jî dewam bûye min dixwest ku herrime wir jî. Ji dû xatirxwestina li Qulekê re, em di ser Qirşehîr –Kamanê re çûne wir. Bi çend rêşaşkirinên, wekî ku em ber bi kepira Kaniya Kûrik de herrin, em gihîştin Terziya. Lê em hinekî dereng jî man.

Ji berê de peywendiya me bi cenabê Vahit Duran ve, li ser van tiştên min li jor qal kiribûn, çêbûbû. Xwedê jê razî be, min niyeta xwe ya çûnê pê re got şûnde jî pîrr ji me re bû alîkar. Her gavê li me dipirsiya, ka em ê çito xwe bigihînin wê derê. Ew bixwe ne li gund bû, lê him dê û bavên xwe, him jî hevalên ku agahdar kiribûn, bi dilgermiyeka mezin li me bûn mêvandar. Me dîsa sohbetek li ser Kurdên Anatoliyayê, hatina wan,



Fatih Aydın û Nuh Ateş

bicîhbûna wan a li wir û rewşa wan a berê û niha kir. Lê wext teng bû, rê jî li me dirêj bû, loma me xatir xwest û em ji wir derketin û me bi xanima xwe û lawê xwe ve dîsa lêxista rê ya ber bi mal ve. Lê bi dilê ku li wir mayî, bi serdaneka temamnebûyî.

Tiştê ku min bi vê serdana biçûk re dîtibû ez dikanim bi çend şorran wiha bibêjim: Rewşa aboriyê ya Kurdên Anatoliya Navîn bi giştî, ji gundên li Kurdistanê pirr baştir e. Ew tiştêkî pirr hêjayî kêfxweşiyê bû. Ji ber ku min berê berdestiya Kurdên me li Heleb, li Tehran û Stenbol û bajarên biyanî dîtibû ew tiştêkî hêjayî kêfxweşiyê bû. Dêmek ku mezinan berê bilasebeb berê xwe nedane wir. Lê tiştê ji çêtirbûna rewşa aboriyê zêdetir

hêjayî kêfxweşiyê ew e ku, herçiqas tofana asîmîlasyonê ya çend deh salên dawîn li wir jî bandoreka mezin berdaye jî, ji aliya parastina zimên û çanda Kurdî de jî, rewş ji gelek cihên Kurdistanê rindtir e. Helbet belavbûna mîna nokên li ser tehtë ya li her derên cihanê, rabûna li hember pelên vê tofanê zehmettir dike, lê, di ber re, ew bûye wesîleyeka hişyariyeka xurttir jî. Pê re him îmkan û firsend jî pirr bûne. Pirs ev e ku ka em dikarin van îmkan û firsendan çiqas bi kar bînin.

***Fatih Aydın**, di sala 1981ê de li Semsûrê hate dinyayê. Endazyar e, lê di wara Kurdî de, li ser werger û nivîs û programsaziya kompîtûrê kar dike.*

VÊ ŞÊXBİZAYNÎ NÎVÎR (BEDU-A)

Xamgelî Bane

1. Har vikeftay û ve canit keftay
2. Ve şîmi gurgî vay
3. Şeqitle şeqit kefta
4. Rizqet je ey dîye elata
5. Guştî canit virizîya
6. Bu rêt kefta
7. Ve veri tekerî keftay
8. Malet kepîr ma
9. Le mîngane vimînay
10. Maletan mîrat vimîna
11. Ve miraret şa nevay
12. Cizine vêt kefta
13. Perdiyete le dar vimîna
14. Çêwgelit eme va
15. Zanit ve dar va
16. Dwî je maletan ne eley
17. Darî nuçi kwînit va
18. Marî swêr ve zanit na
19. Lêt ve axwi û kefecan va
20. Lêt ve jexer va
21. Nana le gelît vimîna
22. Bextit sê va
23. Destit de bexelit vimîna
24. Rwît sê va
25. Ve sivaye neyay
26. Tay vêt kefta
27. Jan de zikit kefta
28. Demit piri xwin va
29. Zikit ve şîreve va
30. Mezgi serit virişîya
31. Çêwgelit erûşîya
32. Kefelit ve dar va
33. Soxît ve xwêr neva
34. dwiri dîye xwinî re qirtikit kefti
35. Şewe û rujet teviyek va
36. Birinî le ban zanit vihata
37. Jê xêr nevînday
38. De mal vimînay
39. Pîlit de verit kefta
40. Pîlişanit vişkiya
41. Kotekî vêt kefta
42. Ve serkû ser vay
43. De naw dîye navit vi çingirîya
44. Seyel çinçik çinçi kê vikarda

45. Çêvê le çêvê nekefta
 46. Destê le destê nekefta
 47. Xaniye ve banitan ewkefta
 48. De bini xake vimînay
 49. Vîriskey lê da
 50. Va vêt kefta
 51. Re çalavî bîbin keftay
 52. Ta lêt kefta
 53. De bini kîye vifetisîyay
 54. Pêlîyelit nuçi swîyet va
 55. Le gelît vimîna
 56. Hulmit vimiçiqîya
 57. Humîrît vişkîya
 58. Rebim zîl nera
 59. Xwin je demit hata
 60. De nav zar û zêçit nenîştay
 61. Xwira xezevî ve serit varda
 62. Xwinî re kefelitan kefta
 63. Xwerîyî ve canit kefta
 64. Xaniye elîşîya ve banitan
 65. De malet ne hevay
 66. Dunde ve dîyay ne kefta
 67. Xwira bêj beterit kirda
 68. Le naw dîye le nan vigerdîyay
 69. Le limikî nan vigerdîyay
 70. ve kerî vay
 71. ve canit keftay
 72. Ger vay
 73. Kerr vay
 74. Kwûr vay
 75. Kût vay
 76. Kirme de canit vi qijqijîya
 77. Ve bini motirî ve pelîle vay
 78. Xincixal vay
 79. Ve swêyîca keftay
 80. Ve sivaye neyay
 81. Ceyirit je demit viderkefta
 82. Mî re memikit kefta
 83. Je dîye rizqet ela ta

VE ŞÊXBIZEYNÎ NIVIR

Smaylê Şêxbizeynî

1. Xwuda dem û zanê le yek vi-xista
2. Xaniye ve banitan erûkefta
3. Destê le destê nekefta
4. De bini xake vimînay
5. Birinî le ban zanit vihata
6. Marî swêr ve zanit na
7. Nana le gelît vimîna
8. Dûwî je maletan ne elay
9. Lêt ve axwî û efecan va
10. Lêt ve jear va
11. Bêytel mînay
12. Maletan mirat vimîna
13. Malet kepîr vimîna
14. Guşti canit wiriziya
15. Ve şîmî gurgîway
16. Rizqet ve duya qertela kefta
17. Çêvê le çêvê nekefta
18. Ve serkû ser vay
19. Jê xêr nevîndanday
20. Şewe û rûjît teviyek va
21. Kefelit de binit va
22. Çêwgelit erûşiya
23. Demit piri xwîn va
24. Jan de zikit kefta
25. Tay vêt kefta
26. Ve sivaye neyay
27. Rûit sê va
28. Destit di bexelit vimîna
29. Bexitit sê va
30. Virîskey lêt kefta
31. Ta lêt kefta
32. Va vêt kefta
33. Re bin çalavî keftay
34. Le gelît vimîna
35. Xwîn je dem û guput vata
36. De nav zar û zêçit nanîştay
37. Xwuda xezewî ve serit da
38. Xwînî re kefelitan kefta
39. De malet ne hevay
40. Dax le dilê kefta
41. Xişxişa le gelît kefta
42. Arig ve canit kefta
43. Xwuda pêkit kirda
44. Qe ve dûyay ne keftay
45. Hundirîne xiraw va
46. Henesiqê vi ti kî ya
47. Rût se wa
48. Çêwgelit vi ti kî ya
49. Jan de zikit keftay
50. Umrut qut va
51. Hesretî le limikî nan vay
52. Şallam de şûnî ne hevay
53. Bejn û bale de herik kefta

HEVPEYVÎN: Hunermendekî heja û zîrek; NEDÎM DAĞ

Amadekar: Muzaffer Özgür

*Tu dikanî xwe ji bo xwendevanên
me bidî nasîn?*

– Navê min Nedîm Dağ e. Di sala 1977an de li gundê Kutiga yê giredayî Cihanbeyliyê hatime dine. Niviyê gundê me ji eşîra Celikî ye. Malbata min jî yek ji van e. Min dev ji dibistana lîsê berda û di sala 1997an da hatim Danîmarka û li vir cîh girt, li vir dijîm.

*Çend sal in an jî ji kînga we tu bi
musîka kurdî re mijûl î?*

– Bi rastî bi musîkê re ez kurik bûm eleqa min hebû. Dibistana sereke de min xwe di nav musîkê de dît. Di malbata me de xort kilama/strana dibêjin. Bavê min jî kilambejêkî baş bû. Pismamên min stranbej in. Dengên saz, bilûr û defê di kurikîya min de li mala me her dem hebûn. Nezikî deh sal in beste û gotinên kilama dinivînim.

*Bingehiya musîka te çiyê? Dema
te beste-gotin nivîsandin ji çi
motivasyonê digirî û bi kilamên
xwe tu çiqes bi Anatoliya Navîn re
giredayî?*



–Ez guhdar û rexnevanekî baş im. Dema li mala we kilam hatin gotin, saz û bilûr hat lîxistin beriyê meriv berva musîkê dibe, guhên te têr dibin. Bi kef û çoşekê berva musîka kurdî çûm. Dema ez gotin û musîka xwe dinivînim çanda govend, şîn û evînê ya kurdên Anatoliya Navîn, kultura me ya devkî, dengbêja didim ber çava. Di malbata min de edebiyata kurda ya bi devkî, bilûr û dengbêjî hebû, vê jî li ser min pozîtîf tesîr kir. Ez di bestên xwe de li Anatoliya Navîn im. Li gunda me, li deşt û baniya me, li ber pîrîke ke an jî li ber kalekî me, li ber keçikika xweşik im.

Dema me dema asimilasyonê ye. Teknîk û medya pir pêşta diçe, ziman û kultura me di bin erîşên asimilasyonê de ye.

Ez dixwezim li gor xwe, bi karê xwe li ber vê bisekinim. Zimanekî zelal bikar tînim. Zimanê ez bi kar tînim li Kurdîstanê jî te guhdarkirin. Li ber xwe didim ku ma ferq tunebe.

Heta niha te kêjan stran an jî çend stran amede kirin? Yek ji van jî 'Çavreşa min' e. Ji aliyê gelek stranbêja va hatiye gotin. Li ser Youtube bi deh hezeran hatiye guhdarî kirin?

– Heta niha nezikî 20 stranên min li bazara musîkê belavbûne, ten sîran. "Çavreşa min" eleqeyeka mezin dît. Cara yekemîn birêz Murat Küçükavcı bi klîbekê got. Li ser zimanê sedhezaran e. Lê stranê weng bi rastî her dem nikanî binivsinî. Motîvasyoneka pir baş da min. Serbilind bûm.

Di salên dawiyê de musîka kurdî gelek pêşket, ew kefxwaşiyek e. Pêşketina internetê, medya dijîtal û pîrbûna televîzyonên kurdan fersendên mezin dan hunermendên Kurd. Tegihêştina bazarê baş bû. Youtub ji bo bigehî civana rêya gelek baş e.

Di pêşerojê de proje yên te çi ne? Ji me re behsa wan bike?

– Ez xwe amade dikim ku çend bernameyên xwe bigihînim gel û hezkirên xwe. Gelek ji min te xwestin ku ez straneka xwe bibêjim. Li ser kar im ji havînê bi şûnda ez ê bi single xwe stranekê bibêjim û derkevim ber hezkirên xwe.

Bi dîtina te di nav civanên me de eleqaya bi kurdî û musîka kurdî çawa ye?

– Eleqa heye lê dûrê daxwazên me ye. Sedemên wê jî cûr bi cûr in. Bi taybetî jî di salên 1980î bişûnda di nav gel de kultureka teng û tesîra musîka arabesk pir salan berdevam kiriye, hîn jî xelas nebûye. Ew tesîr li ser musîka me jî çebûyê. Hîro bi navê kultura popûler derdikeve hemberî me. Têgihîştineka rojane, musîka bêwêj e. Li derwayê welat rewşa civanên me jî pir nebaş e. Civan di bin tesîra musîka oryantî, alaturka û koçekê da ne. Ew kultur bi mejî û dil hatiye qebûl kirin. Li dawetan bi du an jî sê govendan roja xwe xelasdikin. Asimilasyon gelek zû pêşta tere. Em dikanin li ser karbikin. Kar gerek e.

Di nav civanên me de ji bo aîdiyeta xwe legerînek jî heye û ji bo we jî bi kurdî re alakayek mezin, bingehiyek çêdibe. Hîro li welatê

me, her çar aliyan de şer heye û tesîra xwe li ser civana pir mezin e. Bi musîka kurdî li xwe xûdan derdikevin. Ji aliyê kulturî û netewî de bi rêya musîka kurdî aîdiyeta xwe dibînin. Rexistinên îslama radîqal jî pir bûn û tesîra wan jî li ser civanên me çêdibe. Ew jî pirsgirekek giran e!

***Li ba Kurdên Anatoliya Navîn
musik di çi merheleye da ye?***

– Gelek hunermend hene. Li welat an jî derwayî welat karê xwe dikin. Pirs jî gelek in. Arşîva me ya musikê tuneye. Ji efsane û heqat ên li aliyê me hatin jiyandin, çîrokên me, evîn û şînên me musik tunen an jî kê m in. Ev jî me belangaz dike. Çend hunermenda li dor gundên xwe teng tişt berhevkirine lê têr nake. Lekolîneka akademîk gereg be kirin. Dema di destên te de dîrok tunebe, ji aliyê ziman û melodiyê de pêşdaçûyîn zehmet e. Karûbarê Bîrnebûnê ji bo wê pir gereg e û di cîh daye.

Musîka tê çekirin li Kurdîstanê jî te guhdarkirin. Stranbejên Kurdîstanê, aliyê me nû nasdikin û tekilîya me hatiyê avakirin. Pirs a popîlîzmê û aboriyê qelîteya musîka me kê m dike. Him jî aliyê beste çekirinê him jî bi gotinê li Anatoliya Navîn heval hene ku gelek baş karê xwe dikin. Ez bi van serbilind im. Li aliyê din jî

tiştên meriv pê diêşe jî hene ku meriv gereg wan rexne bike. Her kesê gotî ez hunermend im/dengbêj im albûma çêdike û qelîta musîka me kê m dibe. Karê me gereg baş be ku em ji bo pêşeroja kultura xwe û bi taybetî ji hunermendên civan re bibin rêber.

***Li dawiyê tu ji bo xwande vanên me
çi dibêji?***

– Di nav şer, qetliam, surgûn û koçberiyê de çîrokên berê, dengbêjî û stranên evînê kê masiyên mezin in. Em li wan digerin. Li ber xwe didim ku di va jiyana dijîtal û hundirî xwe yî vala de çend tiştan fam bikim. Ma civanê me li ber xwe bidin ku musîka xwe nasbikin. Dev ji kultura xwe bernedin.

Ez ji Bîrnebûnê re spasiya xwe dikim. Yek bi yek bi min re tekilî çêkir. Ez gelek memnun bûm. Bawer dikim di pêşerojê de hîn zêde komel û rexistinên kurda bi hunermendên me re têkevin tekilîyê, li wan xûdan derkevin. Rêz û silavên xwe ji bo hemû xwandevana dikim. Mala we ava ku hun karekî hêja û qedirbilind dikin.

Jêrenot: Pirs bi kurdî hatin pirsîn û birêz Nedim Dağ bi tirkî bersivên min dan. Min ew wergerandin kurdî.

Sîyarê Têrika -8

Bi zaravayê mikailiyên Polatliyê

Dr. Mikaîlî

drfyildiz@hotmail.de

Zewaca Osê

Os bi xenzurî xu va gihiştin malê, kevork çû hindê keça xu, gavekê bi vê va bi tenê deng kir, Os ji ber meraqa peqîya. Ka Asparike bê çi? E çito bersivê bidi? E Osê bixwazi, yan na?

Gavik şunva Kevork bi keçika xu va derketin hatin, Kevorkê çav şil kiriwû û Asparikê jî gep û gûk lê sor bû wû, bi fedi li Osê dinêrî. Os berda çû ku bersiva wê, Erê yî.

Kevork got; Oso ji vê şunva tu lawê min î! Delalîka min jî te dixwazi! Oso hema rawû pê, çû desti Kevork, ew girtin û paçkirin. Kevork jî ew ji enîşkê da... Gavikê di xêni da bêdengîyek peyda bû. Kesî nediwêrî tiştikî biwêji. Bêdengîyeka herkes jê razî û şad...

Osê seri kiriwû ber xu, li benda gotina Xenzuri xu wû.

Wek erf û edetên kal û bava.

Gotina yekê û a doyyê tim a mezina wû. Kevork kuxîya, gewriya xu pa kir, çex wana bû û got;

– Em hema nişana ve bikin û dû ra ji dost, heval û xisim ra va işî bixêr biwêjin. Piştî wê jî di wexteka nedûr da, dawata we bikin.

Oso lawê min, tu naxazi dê û bavî xu jî ji vê xeberdar bike?

Ger rizaya wan jî hebe, tu dilî wan jî hilgire!

Mezin hertim mezin in, wakîna nini? Ji dê û bava sûhatin nawe!

Osê bi fedi got; Walleha tu halî min dizanî, ez ji mal revîya bûm, nika newêrim cardin herim hindê wana, ez nizanîm ka bersiva wana yê çito biwi?

Ku Xadê izn da, bû qismet, em ê li dû dawate, di demeke musaîd da herin destî wana paçkin, efuya xu bixazin.

Ez wekina difikirim, dîsa jî eger hûn biwêjin here, ez ê herim bangî wana kim! Mezin hûn in!

Kevork jî dizanî ku ew ê vê pirsê akîna bibersivîni, lê dixwast ku bira di serî wî da tu tiştik nemîne û dilî wî jî sar biki. Û jê ra got; Tu rast e, ez ê nika te bi dergîsta te va bi tenê dihêlim, berî zewacê pir tişt hene ku meri li ser dengke, zelal biki!

Rawû çû xanî xu, Os bi Asparikê va gavekê bê deng û bê livandin ziq bûn li çavi hev nêrîn. Osê nedizanî çi bikî, nedixwast tiştikî çewt jî biki

û dilî dergîsta xu bişkênî. Asparikê halê wî baş xand û rawû hat, li tenîsta wî runişt.

- Oso dergistê min î delal! Tu ji min hez nakî, tu çima nê hindê min? Yan jî tu ewqas bi fedi yî?

Bi dengêkî nermik û wek hinguv, bi çav xu yî wek ku ar tê da yî, li zik çavi Osê mêze dikir. Os bi vê nêrîna wê şewitî, ar pêket, heş li sêri çûn.

Te yê bigota qey wî şuşeyek araq bê av û bê meze bi serxuda kiri wû.

Hema Asparik hemêz kir, zing zinga dilî herdûya bû, bi hev ra dihezîyan, Osê germahîya bedena wê ya xort û jîr di bedena xu da dibîst.

Destê xu di ranav porî wê da kirin, giran giran tê da gerrandin, ber bi jêr xij bû, li ser nava wê, hêta wê geriya. Ew qas nêzikî hevûdu biwûn ku Osê serê çîçikê wê li ser singûbera xu his dikir. Serê çîçikê pêhesîyayî û piç bûyî... Asparikê çavê xu girtiwûn, xu bê şert û merc avetiwû hemêza, Osê. Teslimî wî biwû, xudanineka ji dil û bê berxwedan. Lêve xuyî wek kiraza dihezîyan, gep lê sor biwûn.

Osê got; Min çiqas jî bîra te kiriyî, porsorê, delala min, evîna min! Û bi tirs, bi xastik, ew ji gepê, ji eniyê û ji stû paç kir. Asparikê, bedena xu hîn jî gêr bû, dil ji sîngê derket.

Oso! Ez jî ji te pir hezdikim, lawo Xadê tu ji min ra şand! Û xûz bû Os ji dêv da paç kir.

Osê ew çîne paçkirinê bihîstî wû lê nedizanî çito yî, şaş bû, tevlihev bû, Asparikê fersend neda wî û bi lêva wî a jêr va girt û pê mijiya. Osê ji vê pir hez kir û wî jî weka wê kir. Nezanîn wext çito derbas bû, bideqqa, bi saeta bi hevûdu lîstin, hevûdu hemêz kirin, paçkirin û destên hev li ser bedena hevudu da gerandin.

Wek du zaryê çûk, ên ku hîn nû tiştikî nasdikin û hetanî ku hewesa xu ji vê hildînin, wê ducar dikin, bi hev lîstin. Ji hev têr nediwûn. Herdu jî bi hev ra ji xu va çûni, Bi dengê dikî siwê heşar bûn. Wek du marî ku li hev pêçiyane, ketiwûn hemêza hev.

Li hev mêzekirin û bi hev ra keniyana. Fediya wana jikestî bû, hendi tenê tiştik di bîra wan da wû, tehma du bedenên xort û tîyî evîn ê!

Lê Asparikê dizanî ku Bavê wê ji ye nika ji xewê rawi û herî kar. Ew ê li benda amadekirina xurînîyê be, ew işê wê bû.

Hema Osê ra got; Evîndarê min, ka nika here mala xu, ku min sifre ji bavî xu ra amade kir, ezê warim bangî te kim jî, Os paç kir, Osê hema ew bi du piya hemêz kir, ji stû da paçkir û bê dil çû mala xu. Ning pêsta û dil bi paşva diçû.

Qe ne dixwast ji va xevna şîrin rawi! Qe ne dixwest ji rindika xu biqete. Li mal devrûyê xu şuştin, di

neynikê da li xu nêrî, bi xu xu ra got; Oso lawo ew çiwû? Xevn yan jî Xeyal?

Pir bi kêf bû, dev bi fitikê kir, klameka dila a kurmançên wê derê wana lêdixist.

Ax lê sewê, sewa te nine, sewa kê ye?

Eze te paş kim devdû cara,

Ez ji bo te ketim çiya û wara

Sewa te nini xayîn sewa kê ye?

Ji klamê dila pir hez dikir.

Derî lêket, Asparik hat; Oso bavî min dixwazi, em bi hev ra xurînîyê bixwin!

Bi dengekî bilind, ji bo ku bira bavî wê bibizî, tu ye bê qe ne ew, lê bav dixwazi Osê pir biwîni.

Bi çavên tiji ken, bê deng ji hev dîsa hezkirin. Di wê angê da şeva wana ya yekê ya ku wana tê da heta bi serxuhêrin ji hev hezkirine, lê hîn jî têr nebûne, hat bîra wana.

Os li pêşiyê, ew li paşiyê çûn oda xwarinê. Os bi Kevork va ji malê derketin, Kevork çû ji bo nişanê çend meri û xisimê xu dawet ki, Os jî çû hindê Şewqî Efendî û dû ra jî bi wi va tevhev çûn hindê Mewlana Xalid Efendî. Ew herdu vekilê wî yê li xerîwîyê wûn, li wî xwadî derketi-wûn, Os di saya wana da hatiwû va merhalê.

Şewqî Efendî ji Mewlana ra rewşa wî qal kir, ji wî icaze xwest. Ji ber ku Asparik Îsevi bû, yermanî bû, icaza

wî hewce bû. Mewlana Xalid got; Hetanî ku ew bi dilî xu derbasî dinî heq, dînî Îslamê nebe, em nikarin bi zorê wê bikin musulman!

Lê hûn dikarin heta dawatê hevûdu nasbikin û tu fikari ji wê ra qala bawerîya me bikî.

Li gorani şeriatê, tu mecbûr e bi jineka musulman va bizewici!

Osê di dilî xu da, ji xu xu ra digot; Walleh çi biwi bira biwi, ez ê dîsa jî bi Asparika xu va bizewicim, tu kes, yan jî tiştik nikari me ji hevûdu biqetînî.

Evîna wî li ser hertiştî ra wû.

Dû ra çû dukana xenzurî xu, bi wî va wexta nişanê birrîn tiştê nişanê kirrîn.

Şevêkê Şewqî Efendî û du hevalên Osê yê ji medresê hatin mala Kevork, Asparik bi emrê Xadê ji wî xastin û nişana Osê pêda kirin.

Asparikê ji wan ra qehwe çêkir anî. Şewqî Efendî û hevalên Osê bi bedewîya wê, şîrinîya wê heyran man. Dû ra wekî şerr-î bû, nikaha wana ji çêkîrin. Ji boyî ku nekevin guna. Os û Asparikê va di wexta nikê da di bin çava da bi wana di-kenîyan. Wan nedizanîn ku ew heta ku ji xu derbasbûni, ji hev hezkirini, ketini ba hev.

Ew gunekar wûn, ew dilşa wûn. Çend keçikên cirana şerbet gerandin, Şewqî Efendî û hevala zêr

bi bûkê va kirin, Osê jî qorik zêr, guhar, bazin û kembereka zêrîn a Diyarbekirê wek nişanî kirrî wû, ew pêda kirin. Kakil kuncî hatin, mêve û şîranîyên ji Pera ya Stenbolê jî.

Xeyrimuslima li taxa Pera ya Stenbolê gellek pastexaneyên bi nav û deng hewûn.

Ose jî ji tehma wan pîrr hezdikir, Kevork wek kesekî qitmîr, destteng dihat naskirin, lê ji bo keçika xu çiyî bajêr çî xaş heyî, gî hanî wû.

Heta nivî şevê xwarin wexwarin, herkes pir şa bû, lê ji giştika pîrrtir jî Os û Asparikê va!

Di şerbetê da wek edet bû qeling jî birrîn û dema dawata wan jî.

Ji meha da gulana bû, di serî payîzê, meha Îlonê da jî dawata wana ye bûwû ya. Ew tarix ji Osê ra pîrr dût û dirêj hat, lê mezina ew wakîna birrîwûn.

Os û Asparikê ew çend mehana da herro hevûdu dîn.

Ku rokê tiştik biwûya, hevudu nedîwana, bîna wan dimiçiqî. Osê dixwast dawateka wek kurmanca bi def û zirne lêxîni. Li taxa Misir Çarşisi, gellek kurmanca hewûn, pîrranîya wan ji Kurdistanê, ji bajari Sêrtê pale wûn. Barê malê xelkê bi piştî xu dikşandin.

Bi vê jî hinkî pere, xercî qezenc dikirin û ku yek ji wana diçû welêt, giştika ew perê ji zavzeçî xu ra dişandin.

Ku wana tişt nedikşandin, di nav xu da klam distirandin û govend dikşandin. Suk û kolanên bajêr şên dikirin.

Ku Os ji xeriyê pîrr asê diwû, bihtengt diwû, xu diavêt taxa wana, li ba wana wext derbas dikir.

Esnafe û xadî dukandaran, bajarîyên Stenbolê bi ew kêfa wana him şa diwûn, him jî şaş û metal diman. Ew kurdên gî bi rû û simêlên bada, bi bedenên xurt ji bo bajarîyan pîrr balkêş bûn.

Hinekan bi tirs, hinekan bi heyranî sêra wan dikirin.

Os çû nav wana, ji paleya ra qala dawata xu kir, ew dawet kirin.

Pîrranîya wana ew nasdikirin û bi serketîbûna wî jî serbilind wûn.

Di nimêja Înê da ên dîndar dihatin mizgefta ku Os tê da wezîfadar bû û guh didan dengê xwendina qurana wî ya xwaşik.

Ku derdiketin derva, ji bajarîyên li dorvana ra bi serbilindî digotin; Ew mela, kurd e û hemşerîyê me ye.

Wana xwandin û nivîsandin ne dizanîn, dua jî. Diçûn nimê kin, lê bi cemaatê va tevhev radiwûn û rûdiniştin. Pîrranîya wana musulmanê Şafî wûn, lê di nav wana da wek Osê yê Sünni Hanefî jî hewûn. Ên ji aliyê Eleziz û Dersimê jî Eleewi, qizilbaş wûn.

Ji wan pîrr kes bi rîya Mewlana

Xalid ketin ser rîya Neqşbendîtîyê.

Ji ber ku gîştik pale wûn, tu kesî cûdatî di nav bawerîya xu da nedikir.

Stenboliya jî ji gîştika ra digotin; Kurd an ji bi erebî, bi osmanî Ek-rad...

Ji bo wana gî yek bûn.

Wana ji Osê ra gotin; dawata te em dikin, tu qe meraq neki!

Stenbol bira dawateka kurmanca biwîni! Osê nezanî ew havînê çito derbas wûn. Wexta dawatê hat, Çiqas pale, hafiz, esnaf, cîran hewûn, gîştika kincên xu yî hîn nû, rindik li xu kirin hatin ber malê.

Hîn ji wana bi hespan hatiwûn.

Li paş malê çayirik hewû, digotin Çirpici çayiri.

Pala li ser wir kon wedan, def û zirnê dest bi lédana aveyî govendê kirin. Cîran jî gî hatin, muslim, xay-ri muslim tevlihev bûn, Li Stenbolê çiqas millet, ol hewûn, ji gîştika meri hewûn.

Paleyên kurmanc cirit avêtin, tîr kişandin hesp beyandin, pêlwanî kirin, turê lîstin.

Ku ew diwestîyan jî rûdiniştin, titûn dikşandin, pişti ku bîhna xu didan ber xu, icar jî dest bi govendê dikirin. Bajarî ya hîn li Stenbolê tu şenayî, yan jî dawateka akîna nediwî wûn.

Yermenîyê ku welatê wana jî Kurdistan bû, yan jî wekî ku ew jê

ra diwêjin; Hayistan bû, bi van va diketin rêza govendê.

Tu cûdatî di nav govenda wana û a kurmanca da tunnewû.

Wana jî klam bi yermanîkî strandin û govende xu kişandin, avê yek, gav wek hev. Dawata wana wek li welêt, li gund, sê roya meşiya. Xwarin, vewxarin, listik û şahî bi têra xu hewû.

Ji serayê jî ji Osê ra xelatîyeka rind şandîwûn. Sultanî Osmanîya wek ew rûsim bû, baxistanek wek xelat, da Osê.

Piştî dawatê Os bi Asparîkê va ketin hewletê. Ew hesrete çend gav, dem, saet û mehan bi dawî bû. Bi roya ji malê derneketin, du çemê har gihiştîwûn, tevlihev biwûn, bi hev ra diheriqîn.

Kevork çûwû mala xû ya li hêla behrê û ji bo wana jî paqijik girtî wû.

Paqijjeka jina yermanî. Wê kê-masiye malê dadigirtin û bala xu dida evîndaran, nûzewicîyan. Jinika paqij bi ew evînî û hezkirina wana mat dima. Ew çi eşk bû? Ew çi jihev-hezkirin bû?

Asparik bi zaro dimîne

Meh derbas bûn, Ew bi eşqeka mezin bi hev ra dijîyan, dilşa û bextewar.

Osê malik xu anda kiri wû, lê nika disa bûwû xadan malbateka nû.

Jîyana xu ya berê pir kê m cara dihat ber çava.

Rokê ber bi danî êvarê hat mal, mêzekir ku delala xu, derva li ber bîrê vedirşe, rengê serçava lê spî bû ye.

Tirsiya, xof ket hundir, hema beziya hindê Asparikê û bi dengê bi tirs jê pirsî;

Çi bû? Tu nixwaş e?

Ka ez hema ban hekim efendî kim?

Asparikê bi rûyî xuyî bet û benz avêtîyê, bi kenîneka bi zorê, lê şîrin, bersiva wî da;

Na lawo, dîwaneyo! Hekîme çî? Ew halê jina yî!

Os ji berda neçû, ew fehm nekir.

Çito yanê?

Lawo em nezewicîn?

Erê!

Eee? Çi erê, em newûn jin û mêt?

Os sor bû, serê xu leqand.

Asparikê fehm kir ku Osî ji halî wê nizani, got; Oso tu diwi bav! bav!

Ez bi zaro mie, nebirînîya dikim.

Os wêngê têgîhiştê, qe nedihat heşî wî ku, Asparik bi zaro bimînî û ew jî biwi bav.

Yanê lawekî min e wari dunê?

Asparik hemêz kir.

Asparikê hinkî bi naz ew tot kir, ji xu dûr xist û got;

Hêdî kuro! Ez bi du canî me!

Mêro mêro! Tu ji ku dizane ew ê

biwi lawik? Diwe ku biwi keç, keçe-ka wek min, porsor, gepsor, lêvsor!

Tu wê naxwazi?

Xadê dizane ew ê biwi çî, lê Înşallah ew ê xwaş û rind bi, çêle-keke bi xêr bi!

Os pir şa wû, ew ê bê pî û bask bifiriya,

Got; Erê erê! Ez qurbana te wim jî, qurbana çêlê te wim jî!

Ka em hema herin mizgînîyê bi bavî te din jî, ew jî diwi kalo!

Çûn hindê oda Kevork, Kevork li ber pençerê rûniştîwû, di dest da kitêweka yermanikî, ew dixwand.

Di bin çava da li halî wana nêrî, tiştik hewû lê wî tu mehna ku neda wê.

Pêştî keça wî, dû ra Os çûn destê wî.

Li hêlê wî rûniştin.

Asparikê hema dev bi gotinê kir; Baviko em zêde diwûn, Tu diwi kalo!

Kevork jî çend meh bû li benda vê xeberê wû, di dilî wî da jî hesreta newiyekî derbas diwû.

Hema rawû ew herdu jî hemêz kirin, çavên wî şil bûn, çend rondikê girî, bê deng tol bûn ji ser gep û rûyî wî hatin xarê. Ji ber şawûnê.

Hema rawû çû oda istêra, gavekê di hûndir da ma, wexta ew dîsa xanê kir, di destî wî da zêrikî sor hewû, zêrikî gir û qaling.

Ew anî bi bennikî hevrişim va kir stûyî keçika xu. Asparik ji eniyê da paç kir, dû ra Os hemez kir û paç kir.

-Xadê we bipolarêzi! Li dunê hîn ji vê rindtir mizgînîk din tunne ne!

Wê êvarê şiv hîn bi kêfekê, tehmeke xwarin, hindik deng kirin, lê pir kenyan, bi çavi tiji evîn û eşk li hev dinêrîn.

Ji wê royê şunva, herdu mêra nehiştin ku bira Asparik destî xu bavêji tiştikî. Ku Asparikê bixwasta tiştikî biki, hema ji wana yek bazdida pê û bi hêrs digotin;

Keçê tu dînî? Çima ji me ra nawêji, çi ye bê kirinê, em ê bikin!

Asparik bi va halî wana pir dikenîya û heneke xu dikirin.

Îcar jî ew diqehirîn, sû dihatin. Mîna zarya...

Asparik û çêla di ber bêr da dimirin

Şevikê Asparikê Os heşar kir, xewa Osê jî hinkî giran wû.

Bi desta ew kutand. Oso! Oso! Rawi, rawi nivîne mi gî şil bûn, avêke germ ji min tere!

Os rawû lambe wêxist, destê xu li ser doşegê gerrand, dest gî lê sor bûn.

Xofîk ket dilî wî, lê ew ra Asparikê ne da,

Got; Tu biseke herhal çêla me tê, di rê da yi!

Ez herim bavî te jî ra kim û em ebeyekê bînin malê!

Li benda bersiva wê nepa û hema bê sol bazda derva, çû li deriyê xenzûrî xu xist.

Te yê bigota ew ê nika dêri bişkênî.

Ji hundir da dengê Kevork hat bihîstinê; Hatim, hatim! Kî ye ew? Çi mîna deyndara derî dikuti?

Ronakîya qendila wî da serçavi Osê.

Os di tariya şevê da wek miriyî ji xewê rawûyî xanê dikir. Bi xof, tirsdar.


Bi zorê deng jê derket; Apê Kevork!, ji Asparikê pir xûn diherikî, Amman bigehêji!

Bi hev ra meşiyar hindê Asparikê, Kevork xadan tecrube wû, di carikê da zanî ku hal ne hal î!

Hemma derketin ber malê ji duraxa faytona, faytonek hanîn, Asparik lêkirin, wê tu mahne nedida ew telaşa wana, digot qey ew êbi vî avayî çêla xu bîni dunê, zaten tu derike wê jî nedieşiya, tenê hinkî zêde av jê diçû.

Wê ji ber şevreşiyê ne didî ku ew xûn e.

Wana fayton ajotin nexaşxana serayê, Asparik di hemêza bavî xu



Jineka nexweş

da birin hundir, hekim hatin li ser civîyan, Os û bav ji hundir derxistin.

Kevork keça xu carik din paç kir, Osê bi dizika destê wê girt.

Osê got; Xadê bi we ra bi, ez ê ji boyî we dua kim!

Li derva bêdengîyeka pir bi tirs, li hundir jî denge telaşa hekim û ebeya dihat guhî wana.

Herdu jî bi zimanî xu û li gor ol û bawerî xu, ji bo Asparik û çêla wê li ber xadê digerîyan.

Bi hemdî xu, lê niv umîdvar, bi diltirsî.

Li derva deqqe bûn saet, saet bûn ro, bûn sal, wext derbas nediwû.

Berbanga siwê, dengî banga dîk û muezzîna tevlihev bû, çavi wana tiji xew û dilî wana bi xem.

Deriyê xanîyî ku Asparik lêyî

vewû, herdu jî bazdan, rawûn pê û gotin; Ka ewna rind in?

Di hemêza ebê da derguşek hewû, derguşek bêdeng û qîrrin.

Kevork zanî ew ne tiştikî ji xêrê yî, lê Osê ew pê nedizanî, hema xu dirêj derguşê kir, lê ebê ew bi sivika ji ber destê wî revand û got; Ew keçika we melayikek bû, Xadê ew ji me pirrtir hezkir û hilgirt cenneta xu!

Ka warin carikê jê ra bèn merhaba û jê xatirî xu bixwazin!

Kevork metîn ma, lê Os ji jinûya va kest, ket erdê.

Ne dikiriya bigrî û ne jî dikirîya biqîrrî.

Kevork got; ka rewşa keça min çito yî? Ew xaş i, li pê yî inşallah?

Ebê got; Xadê nexwast newiyî we bê dayik bihêli! Herdu bi hev ra



Goristan

hilgirt bihuşta xu, serê we xwaş bi,
Xadê sebrê bi we di!

Kevork jî hendî nekarî xu bigrê û
bi yermanîkî qîrîya; Oyyy Xadêyo!!?
te li min çî kir! Oy Xadê! Oy Xadê!

Os û Kevork va xu avêtin stuyî
hev û dest bi şîneka dilşewatî kirin.

Dengê wana, gîriyê wan tevlihev
bû, karker û ebeş nexaşxanê jî gîşka
çav şil kirin.

Êşeke pîrr giran bû.

Ose tirkî ya ku li Stenbol hu kiri-
wû ji bîr kir, bi kurmançîya xu, dest
bi şînê kir, êş û azare xu ji Xadê ra
digot;

Ax li minê felekê te li me çîkir,

Tu ji çiyê min qariya, te jin û çêla min binax kir!

*Porsora min, delala min, yermanîya min ji
min dûr kir,*

Xayîné, xêrnexazê,

Ezê hendî li Stenbola bişewitî çî bikim,

Ji kê hez bikim û bi kê va bikenim?

Rîya walîn, ew xebera reş li dor-
berî dost û hevala belaw bû, Asparika
porsor û derguşa wê ya bê nav pêşta
birin Kilisa Yermanîya, dû ra jî birin
camiya ku Osê lê hafiziyê dikir.

Muslim û Xayrîmuslima bi hev
ra rêzgirtin, ji wan ra serxaşi xwastin.

Osê dîsa, lê vê carê ji bo jin û çêla
xu, bi dengêkî şewat Qur,anî Kerîm
xwand, him xwand, him girîya.

Cemaat jî bi wî ra.

Dê û çêle bi hev ra, di gornekê da
dan erdê. Di goristana Aşîyan da, di
bin sîya dareka selviyê da.

Mala wan bi roya tiji meri bû, ji
her ol û milletî. Gî bi wan va girîyan,
ewna teselli kirin.

Lê Os û Kevork va li hundir di
nav meriya da dil vala, bêmehnê
diçûn û dihatin, wek meriyê ji ni-
kada mirî, wek du bedenê bêruh û
bêcan! Hatin û çûn hindik bû, ne
Os diçû kar, ne jî Kevork!

Ji piştî mirina Asparik û keça wê,
ne Kevork li çavi Osê nêrî, ne jî Osê
li çavi wî.

Bi hev ra deng jî nedikirin, ku
tiştik bixastana yan jî bigotana, bi zi-
manî bedenê ji hevûdu fehm dikirin
û ew didan fehmkirin.

Hendi tu tiştik nemawû ku, jîya-
na wan bixemilîne, reng bidê.

Valahîyeka mezin di malê da, di
nav wan da, di dunya wan da peyda
bû. Os her ro diçû ser gorna jin û
çêla xu, heta tariya şevê li ser wan
dima, yek cara Kevork va hevûdu li
wir didîn, le mîna du kesê ku hevû-
du qe nasnakin, li hev mêze dikirin.

Bi vî avayî meh derbas bûn, Tu



Les chameaux se rendant aux Eaux-douces d'Europe

Salut de Constantinople

Kervan, Halkali

tiştikî nedikarî Osê bixapînî, Stenbol
li ber çavi wî reş bûwû.

Rokê bêyî ku ji kesekî ra tiştikî
biwêjî derket ba serokî, berpirsyarî
encumenî muezzîna û jê ra got;

Ez dixwazim derkevim hindê
padişâ!

Çîma?

Ji min ra silayi rehim bû ferz!

Ew 15 sal in min dê û bavê xu
nedînî! Dixwazim herim wana biwî-
nim! Ji wana helalîyê bixwazim!

Ew derxistin ba sultani Os-
manîya, wî ji wan jî xatir xwest, helalî
xwest û çû baxê xu yî ku padişê wek
xelatî dawû wî firot, bi wan perana
ji bazara misir çarşisiyê peşgir, kin-
cûkol, şe û neynik, desmal, mircan
mori û hîn tiştên din ê hûrik kirîn.
Hînik zêr jî jê ra man, ew bi astarî
kirasî xu va dûrîn, weşartin.

Padişê du sipahî jî dan wî, ji ber

ku ew rîya navbera Stenbol û Enqerê
pîrr nerind bû, diz û eşqiya hewûn.

Kevork dizanî ku Os di haziri-
yekê da yî, lê ne ji pirsî, ne jî tevlê bû.

Osê berbangeka siwê çû li deriyî
Kevork xist, bêyî ku jê ra tiştikî bi-
wêji, ew hemêz kir, Kevork jî ew.

Dûr û dirêj hevûdu bernedan, ji
çavi herduyan jî hêstir wek baranê
dirijiyân, girîyeke bêdeng, mîna avê
diherikî.

Dû ra ji hev qetiyân, Osê bêyî
ku li paş xu mêzeki xu ji hewşê avêt
derva, li derva li ser çoka ket erdê,
bideng mîna zarya dest bi girînê kir.

Di hundir da jî Kevork digirîya.

Os bi sipahîya va derketin rê, ber
bi Çola Engürü yê...

Piştî panzdeh sala ew dîsa dizivirî
nav êla xu.

Ew wek Ose lêvse reviya wû, wek
Osman Efendi çex diwû...

Çend kevneşopiyên kurdên Anatoliya Navîn

Fatoş Koyuncuer

Kurdên Anatoliya Navîn bi taybetî jî yên eşîra reşîyan xwediyê gelekî kevneşopiyên/edetên balkêş û watedar in. Ez dixwazim di nav rêzenivîsekê de hinekan ji wan bi we bidim naskirin.

Ji ber ku malbat li cem me kurdan tiştê hêrî girîng û watedar e, ez dixwazim di nav rêzenivîsa yekemîn de mijara «wateya zarokan di jiyana me de» ya ku parçeyekî malbatan ê bêhempa ye, binîm ser zimên.

Wek li cem hemû kurdan, xwedîbûna zarokan li cem me jî gelekî girîng e. Dema jinek dibe bûk, hemû malbat hêvî dike û dipê ku bûk di hundirê salek an hêrî dereng di hundirê du salan de bibe dayik. Dema ku ew dem dirêjtir dibe her kes qala bûk û zava dike û wê bêzarokiya wan ji xwe re dikin derd. Malbat xizan an dewlemend jî bibe, hema piştî wê dema me got dest bi tedawiyê dikin. Heya ku nebin xwedî zarok jî dev jê berna-

din. Ji ber ku malên bê zarok ne mal in, ji bûk û zava re dibêjin yî/yê "korocax" e. Ez texmîn dikim ew layiqdîtî gelekî dilê mirov jî dişewitîne û loma wek çareyekê hêrî dawî zarokê jî malbata xizmên xwe ji xwe re dikin zarok. Ew pir caran an zarokê tî ye yan jî yê zeyî ye.

Tê bîra min berê dema ku jinek ducanî dibû, haya kesî jê nedibû. Wek ku tiştê eyb bibe, wê jinê ducanîbûna xwe vedişart. Demsal havîn be jî ferq nedikir, her tim kincên qalind li xwe dikir, ji bo ku zikê xwe veşêre. Berî welidînê êdî cîran û hevalan dizanîn ku bûka filankesî ducanî ye. Niha her kes ji meha yekemîn ve, pir caran ji heftêya yekemîn ve dibihîze ku bûka filankesî ducanî ye. Li gundan kesên pîr bi belavbûna wan mizgîniyan gelekî hêrs dikevin û dibêjin; "eyba giran e, hîn dergûş di zik de bi cih nebûye, her kesî bihîstiyê jî. Êdî fedî nemaye. Ê me

heta ku zikê me nedihat ber bêvila me, me ji kesî re ti tişt nedigot”. Divê mirov li ser vê nêrînê bifikire ka ew kevneşopî çima hebû û çima zarok -tişteki gelekî girîng û xweş-dema ku di zikê jinê de bû wisa dihat veşartin. Ez hin jî nizanim sedema wê çi ye, ji kê dipirsim, dibêjin, «nizanim diya me jî wisa dikir, digot; eyb e».

Mezinkirina zarokan li gundan gelekî bi zehmet bû. Berî ku dergûş were dinyayê, nivîna wê dadigirtin, jê re kinc distendin. Ji bo dagirtina nivînê dipan ku dema pezbiriyê were û hindik hirî jê re ji nav bigirin. Li odeyekê jê re dergûşek (landikek) çêdikin. Dergûş bi arîke ve dadiliqandin. Berê xisûsî caw (qûmaş) distendin û pê jê re paçê zarokan çêdikin. Gişt wek hev didirûtin. Ew bi dest dihatin şuştin, bêguman.

Jinan berê dergûşên xwe li malê dianîn dinyayê. Li her gundekî pîrikek hebû. Bang wê dikirin. Di hefteya yekemîn a dayikbûnê de ji dayikê re tim gabol/gahol û helaw dihat çêkirin, ji bo ku pê were şîr. Cîran, xizm hwd. diçûn xêrkirina dergûşê û jê re zêr û diyariyên din

ên wekî kinc, betanî hwd. dibirin.

Edeteke gelekî balkêş jî ew bû ku nedihîştin dayik û zarok bi tenê razên. Digotin, divê tim yek li cem wan be ji bo ku wan ji ber pîrka (pêşiya) malê biparêze. Heta ku çilê dergûşê dervediket ew ji malê dervedixistin. Îro her kes zarokên xwe ji roja yekem ve bi xwe re dibe derve. Nizanim berê çima ewqas tirs û xof dikirin nav jiyana dayik û zarokan!

Bi ya min edeta hêrî balkêş pêçandina dergûşan di nav xwelîya germ de bû. Digotin xwelî dergûşê germ digire. Ji wê zêdetir jinan gelekî karên wan li der ve hebûn û wisa bi xwelî dergûş ji ber şiliya xwe aciz nedibû nedigirîya jî zûzû. Xwelî di bêjîngê re derbas dikirin û li ser sobê yan jî li ser sêlê germ dikirin. Tê bîra min lawikê meta min wisa dipêçan. Ji bo wê dergûş wek qozîyan (balûle) bêyî ku dest û lingên wî/wê xuya bikin dipêçan, qundax dikirin. Digotin bila dest û lingên wî di bin pêç de bin ku rehet raze û me jî aciz neke. Ji wê zêdetir digotin dergûş nekeve nav qundaxê yê ling xwar, şek vekirî bibe. Bi ya min bi wê bes eziyet bi

dergûşê dikirin. Ji ber ku ji bilî serê wî ti derên xwe ne li der ve bûn.

Dema ku navika dergûşê diket, ew diavêtin cihekî li derdora malê, yan ser xanî yan jî baxçe. Digotin navikê biavêjin baxçeyê dibistanê ku zarok bîaqîl bibe. Wisa dema ku em diçûn dibistanê me pir navik didîtin, bêguman, pisîk an jî kûçikan ew piştî çend rojan dixwarin. Nizanim wê demê qedera dergûşê çawa dibû, yanê bi xwarina navika wî/wê ya ji aliyê pisîk û kûçikan ve.

Begûman rêzgirtin li cem me kurdan tişteki rojane ye. Ji bo wê dê û bav ti caran li hemberî mezinên xwe bi zarokên xwe şa nedibûn û ew hilnedigirtin dest xwe jî. Ew eyb bû. Hîn jî wisa ye. Zarok li hemberî mezinan nayên hembêzkin an paçkirin.

Mixabin ji wan edet/kevneşopiyên ku min li vir nivîsandine pir winda bûne êdî. Hemû kêmasî û

pêdiviyên dergûşan ji dikanan tên sitendin, kês wek berê dergûşan jî bi kar naîne. Berê zarok di hembêzê de dihatin gerandin, niha ji bo wî karî li nav gundan li ser rêkên tije kevir û xwelî erebeyên zarokan hene. Berê jinan hema hema 6-8 zarok dianîn dinyayê. Îro ew hijmar 2-3 ne. Bêguman yek ji sedeman, perwerdeyîya jinan a ku li gorî demên berê baştir e. Ji wê zedêtir gelek kes êdî li bajaran dimînin û nikarin pir zarokan mezin bikin.

Lê tişteki ku qet nehatiye guherîna heye, ew jî axaftina zimanê dayikê ya bi zarokan re ye. Li gundên reşîyan zarok gişt bi kurdî diaxifin. Her çiqasî gelek tişt dibin qurbanê jiyana rojane ya modern jî, li cem me ziman cih û giringiya xwe diparêze. Ji bo wê mirov dikare gelekî baş bibîne ku zarokên kurdên Anatolya Navîn, bi taybetî jî yên eşîra reşîyan neynika civaka xwe ne.

ZAROKÊN KURDAN

Dergûşek Kobanî me
Ser erdê zêde hatim dîtin
Li welatekî xerîb
Di behran de fetisî me
Ez Alan Kurdî me

Zarokekî Kurd im
Di şevên bê stêrk û tarî
Li kolenek sar
Çend roj in kuştî ramedî me
Ez Hûsîn Botanî me

Keçek Botanî me
Bin axê zêde dîtin
Mala bavê di avsarkê de
Veşartî û cemidî me
Ez keça Kurd Cemîle me

Mem Xelîkan

Ele Heci

Mûlla Evîndar

Ele Hecî: "Baş e, bi xêr hatî, ser seran, ser çavan".

Parêzger: "Tu ji kîjan gund î?"

Ele Hecî: "Ez ji gundê Xelika me, zozanên me ji vir ne pir dûr in".

Parêzger: "Te pez berdaye zeviya"

Ele Hecî kêfek lê peyda bû, di dilê xwe da go "mîna çîroka Hemo dihere".

Ele Hecî: "Keremke were rûne"

Parêzger li nav pez çavên xwe digerlandin berxeke çê îşaret kir go "wê berxê bîne ji min re ezê te ef bikim"

Ele Hecî: "Tu heta vê derê hatî, ez te bê av, bê dew bernadim, ji hesp de were".

Parêzger ji hesp dehat. Dema ku ew ji hesp dehat wî xwe wek şêrê daristanekê dizanî.

Ele Hecî: "Şiva xwe jî bîne"

Parêzger: "Çima?"

Ele Hecî: "Cemêr, mêrxas bêxeber li însên nexin"

Şêrê daristan awir lê hat guherîn.

Ele Hecî: "Heramî, talankar qet ti car cemêr, mêrxas nabin"

Parêzger meşiya li şûna şivê ji

tera hespê xwe xencereke dirêj derxist.

Ele Hecî go "min ji te re bi şivê heta pênc car lêxistin eyar kiribûn lê yek bes e". Carekê bi hêz li stû xist, bi wê lêxistinê gêj bû, kêr ji dest da ket, xwe avêt erdê. Ele Hecî dest û lingên wî bi bizbenê girê da, hilda ser hesp, li ser hesp jî ew di hesp girêda, kendir di wî nûr kir. Hevsarê hespê di kera xwe girê da, berê pezê xwe ber bi zozanên xwe kir û hêdî hêdî çû.

Li rê parêzger li ber Ele Hecî geriya gotin li ser gotinê go:

"Min berde, hespê xwe bidim te"

"Min berde, zêrên xwe bidim te"

"Min berde, çiqes pere dixwazî bidim te"

Lê fêde nekir. Ele Hecî mîna ku guhên xwe ew gotinan qet nebihîstin bi rêya xwe da dewam kir.

Pez hat, kete nav zozanê. Zarokên ku li mêrgê dilîztin dît in ku li ser hesp merivek girêdayî ye û hesp jî bi kerê girêda ye. Zarok bang dikin, xeberê didin gundî

û şivanan. Her kes pê dihese.
Gişk rabûn ber bi keriyê Ele
Hecî çûn.

Ele Hecî go: "Ji heramiyan
cemêr, mêrxas dernakevin lê ji
ber ku li hember wan meydan
vala ye, ew xwe mêrxas dizanin".

Ele Hecî hevsarê hesp da
dest zarokan û bi zarokan re go
"vî li nav zozanê bigerînin û pa-
şe jî bi vî awayî bibin li mêrgê,
berê hesp ber bi gundê wî bikin
û berdin".

Zarokan ew li nav zozanê bi
wî awayî gerand her kes rabû te-
maşe kir.

Paşê çûn ser mêrgê. Parêzger
li wir li ber zarokan jî geriya, go
van girêyên ben vekin min ber-
din. Lê fêde nekir.

Zarokan bi wî awayî berê
hesp ber bi gundê Omera kir,
hevsar ji serê hesp kirin, li pa-
şiya hesp xistin û hesp berdan.

Hesp bi loqan meşiya suretî
xwe girt û paşe jî bi çargavkî ber
bi gundê xwe bi lez meşiya û
wenda bû.

WESTÎYAY ME

Westiyay me

Serê sibê li ber germa tavê

Min berê xwe daye tavê

Rihê min westiyay ye

Çermê bedena min

Xeyîdîye ji tavê

Çavên min ji xewê venabe

Tav bi germahîya xwe

Daxwezî dike ez hêşarê xwe bim

Westiyay me

Bi ser min de pemboy kulîlkên dara di-
bare

Şaney min li gerê ye

Rihê min xeyîdî ye

Rondikê çavên min wekî baran tete xarê.

Gerdûnê li mirovahî teng bûye

Ax bi dijwarî digîrê aş nabe

Daristan wekî min xeyîdî ne

Hemû kulîlkan rengê xwe

Veşartin, wekî min xeyîdîne.

Şükrü Yildiz

ji bîrmeke
ci sar ci germ
tû şîrî xwe neke
axa qûndaxê te
û axa dost û yarên te ye
bext û bêbextîya te ye
Kurdîstan qedera te ye
zimanî xwe mala ta ye
ava bike
nêçîrvanên heramzede yê derketine
nêçîrê heramzadatîyê
em û çîyayên Kurdistanê dilsoz in
mîrov zu bi zu şîrvenakin
dunê ne fireh e
ne li ber bigere ne jî bedêl bida
lê biceribîne

ji bîrmeke
rind û xerab
Kurdistan bextê te ye
terî ku here
kêngê têyî were
Kurdîstan welatê te ye
herdem ji te re singê xwe yî vekirî ye

Seyfî Doğan

Kavir

Seyfî Doğan

Piştî nivro bû. Min pêz li ser kanîyê Hesî Mila avda bişunda, pêz berve Gundî Germikê çax kir. Pez xwe da dawîyê cîyayi herşid û bi geremê dicerî. Min ker barkir û kûpê xwe yî sor tiji ava sar kir û li kerê siwar bûm cûm herdê pêz.

Min, pez berve kanîye çax kir ku carak din avdim. Wext piştî xermane bû. Pezî ku dene dixwar ê zû tî bibe.

Min dît ku kerîyê ku ji alîyê Gundî Tetera da berve kanîyê tê. Min bi lez, pez da ber xwe ku xwe di ber wî kerî bigehînim ser kanîyê. Deme ku ez gehîştîme ser kanîyê, min dît şivanê kerî ku tê ser kanîyê Remezanê Tetera ye. Remezanî ji gundî Tetera bû. Gundî wî, nezîkî gundî me bû. Gundên me dost û ehbabên hevdu bûn û hîn jî wisa ye.

Em, li navbarê herdu kerîya runiştin. Min tebexa titûne zivînî hûşe ber wi kir. Remezan şivanê kî bi heyf bû. Însên dikenî piştî xwe li karen teybetî pi piştî wî da. Wi jî wek hemî şiwanan dizîyê pêz

dikir. Ji hevdû dizî kirin di navbarê şivananda wek edetekê bû. A dudîya jî xizani bû.

Wexta ku dora avdanê hete kerîyê Rêmezên, min kerîyê xwe bi rû kerî Rêmezên xist û kavireki çê birkir nav pezî xwe û hatim ba Rêmezên û xatirê xwe jê xwast. Rêmezên lê nacû ferqê ku min kavireki wî dizî. Ew ê sibê wexta ku xwedîyê kavir li tunêbûna kavirê xwe behêsiya yê hîngê bizane ku ci hatîyê serî kavir. Wî jî çend rojan berê, kîskeki minî çê û mîrov qêmîşê nabe ku lêmêskê dizî bû. Ez î dizanimeki wî dizî. Cimki wê rojê ji kerîyê wî bitir pezê min nezîkî tu keriyên din nebû.

Bi şev, me pezê xwe li kortê kevire gewr da fêzê. Min kavir serjêkir. Me tiştê hundirî zik, kira ber pilavê. Min laşê kavir bi du alîya kir. Nîvîyê min nîvîyê çone. Piştî xwarina min her aliyêkî têrê, para xwe û çone kirê û li kêr siwar bûm devê xwe berve gund kir.

Şevê tarî bû. Hestirk dibirikîn lê şewka wanan dunê ronî nedikir.

Qeretîyê zinarên dawîyê çîyê û qenqelên ku hîşîk bûyî ji şekla kê diketin şeklekê. Car û caran bakî sar xwe li min dipêca û ez diguvaştim. Parsûyên min nûra hevdi dibûn. Dengî xişnîyê gav bi gav ga ji nezîkîyê da ga jî dûrê da dihat. Kîştî bi ser heywanên bejî dikat û dengê kuçîkên kerî me dihatin.

Wexta ku ez nezîkî mêzelî gawira bûm, ez ji piştê kêr dêhatim ku kêr bi hêsa bi neqewêda hilkişa.

Demekî, ez î ketime nav malûhila ji bo wê jî min î xwe demekê wenda kirîye. Ez bi dengîkî ku min lokalîzê nekir û nasnekir veciniqîm û hatima xwe ku ez î li sirtî neqewê me. Min dor alîyê xwe nerî. Min dît ku merîyêki rû û por sipîki yî li ser zinarî keviyê neqewê runîştiye. Navbare me kalê du sê gav bûn. Kincaka reşê dawûdawîyê li xwe kirîye. Serî di berda. Bi sedan sirî ketibûn linga. Dunê tarî ye. Lê cîhê ku kal li ser zinêr rûniştî ronî wek roje bû. Min xwe şaş kir.

Min dît ku têra min e teliwê. Gavrî îhtîyarî, min xwe paşta kişand. Ker neyî rehet e. Li cîhê xwe danewestê. Dor alîye me ji nişkeve ronî bû. Totekê li ser zinarîkî biçuk danişt ku dev da marekî bi du

serîya heyê. Kervanakê mêrîyê reş di ber min re derbas bûn.

Min mêla xwe da têrê ku laşê kavêrê yî giran û giran ji têrê derdikeve. Dengên kuçîkên kerîye me yî li gor bê ga tene ga nayêne.

Herdû alîyê kavîrê ji têrê derketin û bûn yek û xwe dan ser piştê kerê ser sêmer. Ez lal bûm.

Kavir hate zimên.

–Na şivano na!. Nebû şivano nebû!. Ez hêvîya jinebîyê Menbike bûm. Jina Hemzî Teter.

–Ez jîyaneke ber mirad bûm.

Ez î xêrnedî. Ci xwelîyê bi serê xwe kim!?

Min got;

–Em de ji wî kalî bibirsin. Kaw ew dibê ci.

Em cûn ba kalê. Kalê sûretî xwe yî xûya nekê. Rûyê li navê ne. Kalê kî hîn me meremê xwe negotîyê, bi dengêkî otorîtêr got; ez nexwazim di navbarê we kevim.

Zûtik

Yekî ji wan gundên me li odê Hesî Bêkes qala serpêhatîyê ke xwe dikir;

–Min teskerê xwe girt û bi lez û li paş xwe mesnekir xwe da ser rê.

Bi rêvîtiyê trê û otobûs xwe ge-
hande Kuluyê.

Hatim ser rîya gundî me ku we-
sitakê bibînîm pê herim gund. Min
li wir Hesê Malê Bêmal dît. Ew jî
wek min li bendê wesitakê bû.

Tu wesita nehatin, yê ku hatin
jî em heynenênî. Loma em bi peya
ketin ser rê. Wexte xermaneyê.
Dûnê dişawitê.

Wexte ku em hatin ser neqewê
baxe gund ji me ve xûya kir. Ez ji
nişkeve ji zimên da ketim.

Gava ku hişê min ê bicûk, ha-
tin serî min î giregir, min dît ku li
jêr gund, berve Kuluyê, jor kanîyê
jêrê, kuçên hene. Kuçên zer û sipî.
Min nizanî, ew kuçên çi ne?

Kuçên wek konê eskerîyê li tat-
bikatê ziwistanê bûn.

Gavakê fikirim ku navên wan
kuçan biderxim, lê bêfêda.

Newêrime ku ji rêhevalî jî bipir-
sim.

Dudil im.

Divê ku rêhevalî min ê, sibê ji
min re bi serhevdeke û qerfên xwe
bi min bike.

Eskerîyê hiş li serê min nehîştin.
Mejoyê min bi tirkî û tirkbûne
şuştin.

Mejoyê min wek memikê ku
mar mêjandi bû. Pûç û sewr.

Min xwe, malbeta xwe û der-
dorê xwe ji bîr kir. Min zimanê
xwe ji bîr kir.

Dema ku min dest bi Elî okulê
kir, min bi xwe û xwe digot; ez
nasnamê hundirî xwe teslîmê wa-
nan nekim. Ez ê nasnamê xwe
